# HAWAR

Rojnameya Rojane
24 Gulan 2009
Yekşem
Sal: 1
Hejmar: 19
Buha: 50 Kr



1 Hezîranê
Rojnameya we
Azadiya Welat
li bayiyan e





# HIŞYARIYA DAWÎ

Rêveberiya Koma Civakên Kurdistanê aşkera kir ku ligel hêzên wan di rewşa agirbesteke yekalî de ne jî Artêşa Tirk bi teknîkeke pêşketî operasyon û êrîşên mezin pêk tîne û rewşa agirbestê dike fersend û darbeyan li gerîlayan dixe. Di daxuyaniyê de hat gotin ku ew wek aliyê şer rawestandî cara dawî hikûmet û artêşa tirk hişyar dikin

## 'EV HIŞYARIYA DAWÎ YE, DIVÊ ÊRÎŞ RAWESTIN'

Piştî ku operasyon û êrîşên Artêşa Tirk li herêmê zêde bûn, hêviyên aştî û diyalogê lawaztir dibin. Koma Civakên Kurdistanê ragihand ku herî dawî li bejahiya Dihê li hemberî kademeya jorîn a Hêzên Parastina Gel operasyoneke ji aliyê navenda şer ve hatiye plankirin pêk hatiye û di pevçûnê de fermandarê herêmê jiyana xwe ji dest daye. Her wiha hate destnîşankirin ku divê operasyonên îmhayê yên li hemberî hêzên PKK'ê bên bidawîkirin û wiha hate gotin: "Di vê mijarê de em hikûmet û artêşê cara dawîn hişyar dikin."

## 'DIVÊ AŞTÎXWAZ RÊ NEDIN ŞERXWAZAN'

Di daxuyaniyê de artêş û hikûmet bi awayekî tund hatin hişyarkirin: "Em bi awayekî aşkera dibêjin, aştî û çareserî yekalî nabe, ancax beramberî hev dikare were bipêşxistin. Lê wisa tê fêmkirin ku bi bikaranîna teknolojiya herî dawî dixwazin operasyonên îmhayê berdewam bikin. Em cara dawîn hikûmet û artêşê hişyar dikin. Em ji raya giştî re radigihînin ku ji kuştinên derkevin holê em ne berpirsyar in. Divê raya giştî jî bi çalakiyên xwe yên demokratîk rê nedin şerxwazan."... *RÛPEL - 4*



# Ji Wanê banga 'çekan bêdeng bikin'

Bi deh hezaran kes li Wanê hatin cem hev û zext û zora li ser DTP'ê protesto kirin. Girseya qelebalix xwest ku ji bo diyalog û aştiyê çek bên bêdengkirin. Hevserokê DTP'ê Turk jî xwest xwîna dirije bê rawestandin

Mitînga "DTP'ê bêdeng neke, çekan bêdeng bike, bersivê bide bêpevçûniyê" li Parka Kultur a li cem Keleha Wanê pêk hat. Mitîngê bi meşeke girseyî dest pê kir. Meş ji aliyê jin û ciwanan ve ji du noqteyên cuda hate destpêkirin. Bi hezaran kesên ji bo tevli mitîngê bibin ji bajarên wekî Colemêrg, Mûş, Bedlîs, Qers, Îdir, Erdexan, Erzirom, Êlih, Çewlik, Sêrt û Amedê hatîn jî bi pankartên xwe tevli mitîngê bûn... *R.4*



## Turk: Werin em vê xwîna dirije rawestînin

Hevserokê DTP'ê Ahmet Turk ku di mitînga "DTP'ê bêdeng nekin, çekan bêdeng bikin, bersivê bidin biryara bêpevçûniyê" ya bi tevlêbûna zêdetirî 100 hezar kesî li Wanê hate lidarxistin de axivî, bal kişand ku di pêvajoyeke şer û aştî tê nîqaşkirin re derbas dibin û da zanîn ku wan wek DTP bo çareseriya pirsgirêka kurd berpirsyarî girtiye ser xwe... *R.4*




## Ji jinan banga tevlibûna mitînga jinan

**PARLAMENTERÊN** jin ên DTP'î, bi nûnerên rêxistinên jinan ên li Stenbolê re civiyan û ji bo mitînga dê di 31'ê gulanê de li Amedê bê lidarxistin piştgirî xwestin. DOKH'ê bi dijî polîtîkayên çaresernekirina pirsgirêka kurd û pêkutiyên li ser jinan, dê bi slogana "Lihevhatina Jinan a Aştiyê" di 31'ê gulanê de li Parka Ekînê mitîngekê pêk bînin... *R.7*

## 'Divê gavên stratejîk bên avêtin'

**BI** zêdebûna nîqaşên li ser pirsgirêka kurd, hîndekar û peywirdarên zanîngehan jî bal kişand ser pirsgirêka kurd. Hîndekarê Zanîngeha 9 Eylul Prof.Dr. Îzge Gunal, diyar kir ku pirsgirêka kurd ne tenê pirsgirêka nijadî ye, her wiha pirsgirêkeke çînî ye jî. Gunal, anî ziman ku ji ber DTP'ê bingeheke xurt a muxalefetê ye rastîn heye, rastî êrîşan tê... *R.4*



# 'Êş û jana me didome'

## Xizmên windayên di bin çavan de dîsa bi daxwaza dîtina windayan çalakî pêk anîn û gotin; 'Em ji ber operasyonan bi fikar in'

Çalakiya Xizmên Windayan a "Bila winda bêne dîtin û kiryar bên darizandin" vê hefteyê jî dom kir. Çalakiya ÎHD'ê vê hefteyê jî li Amed, Êlih û Mêrsînê pêk hat. Di çalakiyan de hate diyarkirin ku operasyonên li herêmê tên meşandin dibin sedema fikaran û hate xwestin ku operasyon bi dawî bibin.

Dayikên Şemiyê ku cara 217'emîn çalakiya rûniştinê li dar dixin, di çalakiya xwe ya îro de kiryarên Kasim Alpsoy pirsîn. Dayikên Şemiyê ji bo pirsa aqûbeta windayên xwe bikin û bi daxwaza kiryarên bûyeran bên darizandin cara 217'emîn li ber Lîseya Galatasarayê çalakiya rûniştinê li dar xistin... *RÛPEL - 7*

## Ji DT'ê daxuyaniyeke balkêş

■ Midûrê Giştî yê Şanogehên Dewletê (DT) Lemî Bîlgen, diyar kir ku dê bikaribin 44 sehneyên li 12 herêman ji bo komên taybet ên şanoyê yên bixwazin lîstikên kurdî bilîzin vekin. Bîlgîn, di daxuyaniyê de anî ziman ku komên şanoyê yên ku dixwazin lîstikên kurdî li van sehneyan pêşkêş bikin dikarin sûd ji van salonan werbigirin... *RÛPEL - 6*

# Li Cannesê çîrokeke trajîkomîk



Derhêner Elia Suleyman bi fîlmê Dema Paşvemayî balê dikişîne ser pirsgirêka filistîniyan û bi awayekî trajîkomîk pirsgirêkê vedibêje. Fîlm niha ji bo xelata Palmiyeya Zêrîn têdikoşe û dema mirov li fîlmî temaşe dike ji xwe re dibêje ev der çiqas dişibe Tirkiyeyê. Fîlmê derhênerê filistînî Elia Suleyman ê bi navê The Time That Remains ku li Cannesê ji bo xelata Palmiyeya Zêrîn têdikoşe derket pêşberî sînemehezan... *RÛPEL – 6*

## 'Şivanê Kurmanca' derket

Yekemîn romana kurdî ya nivîskarê navdar Erebê Şemo ya bi navê 'Şivanê Kurmanca' ji aliyê Lîsê ve bi alfabeya latînî, ligel orjînala wê hate çapkirin... *R - 6*



Teşîrês



Mizgîn Bîngol
bingolmizgin@gmail.com

# Ez kurd ew Tamîl

Li pêş çavên cîhanê qatlîama mirovan tê kirin. Qiyamet e. Tang û topên dewleta Srî Lankayê welatê Ceylon bombe dike, hildişîne, hewareke wisa ye 'dê weledê xwe davêje'. Kîna hezar salan e, kîna nekaribûna desthilatdariyê ye û bêdengî û rûreşiya mirovatiyê ye.

Welatê Tamîlan ango Ceylon weke Kurdistanê hatiye parçekirin. Hindistan û Srî Lanka. Bi tenê li Hindistanê 21 mîlyon Tamîlî dijîn. Li Srî Lankayê gelê herî zêde Tamîlî ne, Srî Lankayî hîn qasî ji çaran yek in.

Ji salên 1800'an heta niha şerekî dijwar berdewam e. Dema pevçûn cara yekem di sala 1990 hinekî kêm bûn hate gotin di nava 10 salan de 90 hezar kesî jiyana xwe ji dest daye. Û ev hewara dawî bi tenê di êrîşekê de, di şevekê 350 kes mirin. Bi hezaran kes bê cih û war e û cîhan bêdeng e. Li hesaban tê. Ceylon dewlemend e, heger Srî Lanka maf bida Tamîlan divê Hindistan jî bide û Çîn naxwaze tesîra wê ya ser Srî Lankayê kêm bibe. Ango weke li Kurdistanê 'birîn kûr e gazî dûr e'.

Erê me dizanibû gelê Tamîl heye lê cara yekem mamosteyekî ez dawetî civînek ango civîna 'alîkarî'ya bo welatê Srî Lankayê kirim. Ez çûm şorbeyek anî weke ya me, ya nîskan bû û nanê sêlê. Di nava nanê swêdiyanî kuş kuşî de, tahmkirina nanê sêlê. Piştî demekê ez fêr bûm ev nanê sêlê yê Tamîlan e lê weke Srî Lankayiyan tê naskirin, ev nan di qirika min de ma. Stranên kurdan ên hatine dizîn hatin bîra min, xwarinên kurdan ku navên wan hatine guhertin û her wiha navên gundên kurdan.

Em dibînin çapemeniya cîhanê wêne an jî dîmenên zarokên Tamîlan nîşan didin lê Neteweyên Yekbûyî di rojeva wan de mudaxele nîn e. Ji ber gelekî bindest tê qetilkirin, ji ber menfaetên rojavahiyan hîn neketiye talûkê. Bi tenê dibêjin. Jixwe siyaseta Ewropiyan siyaseta pariyan e. Her yekî pariyekî bide û bixapîne. Çekan didin dewleta Srî Lankayê, kuştinan raberî Tamîlan dikin. Yên ku hêza rizgariya Tamîlan 'Şêrên Tamîlan' weke terorîst binav kirin û pişt didan dewleta Srî Lankayê dewletên Rojava û Çîn e.

Dewleta Srî Lankayê got ku wan Serokê Tamîlan Velupillai Prabhakaran kuştiye. Roja kuştinê weke şahiya dewletê hate îlankirin. Gelê Srîlankayî rakirîbûn ser piyan, wan kuştina Tamîlan û serokê wan pîroz dikirin. Dîmenên wan çiqas dişibiya dimenên komeleyên tirkan ên dema dîlgirtina Abdullah Ocalan. Lê berdevkê komeleyên Swedê yê Tamîlan Govindarajah Jeganmohan digot ez bawer nakim serokê me hatiye kuştin. Û li dawiyê weke Jeganmohan jî derket. Fermî diyar bûye ku serokê Tamîlan dijî. Serokê komeleyên Swedê yên Tamîlan Govindarajah Jeganmohan li wêneyên gerîlayê kurd dinêrî, lanet li bêedelatiya cîhanê dianî û weke min digot; qedera kurdan û tamîlan çiqas dişibe hev...



Serokê komeleyên Swedê yên Tamîlan Govindarajah Jeganmohan û nivîskar Mizgîn Bîngol li nexşeya Kurdistanê dinêrin, wekî hemû gelên bindest wan jî digot; qedera kurdan û tamîlan çiqas dişibe hev...

Awêne



Samî Tan
sberbeyan@yahoo.com

## Em ji kê bawer bikin?

Her kes heman tiştî dipirse, "Tirkiye ber bi ku ve diçe?" Gelo em ê ji kê û ji çi bawer bikin? Wekî dibêjin, em ji çavên serê xwe bawer bikin an jî ji peyamên Abdullah Gul? Birêz Gul got, "Di warê kêşeya kurdan de dê tiştên xweş biqewimin?" Her wekî şivanê ku bi dengê bilûra xwe keriyek pez bide dûv xwe, her kes bi pey vê gotina wî ketiye. Pir kes wisa bawer dike ku di bin vê gotinê de bernameyek, amadekariyeke çareseriyê heye. Li gorî wê jî nirxandin têne kirin.

Gelo bi rastî di bin vê gotinê de tu bername û amadekariyên çareseriyê hene? Ev tişt hê jî ne zelal e. Lewre heke em ji çavên serê xwe bawer bikin, heke em ji rûdan û qewimînên li derdora xwe bawer bikin, li holê tiştên pir xerab hene. Qaşo her kes çareseriyê nîqaş dike, lê êrîşên Artêşa Tirk ên li ser gerîlayên ku xwe ji şer didin alî zêdetir dibin. Li gorî agahiyan, di nava hefteyekê de deh gerîlayan jiyana xwe ji dest daye. Hinek qelemşûrên dewletê aqûbeta Pilingên Tamîlan bi bîra me dixin û ji PKK'ê dixwazin ku dest ji çekan berdin.

Heke ev tenê bûna, me yê xwe bi gotinên, "Dema ku dawiya şer nêzîk dibe şer gur dibe." bixapanda, lê li aliyekî jî hêzên dewletê her roj çend rêveberên DTP'ê digirin, komikên faşîst li hin cihan êrîşên tînin ser mirovên kurd. Ev yek jî têrê nake, niha dixwazin mebûsên kurd bi darê zorê bibin pêşberî dozger.

Di vê rewşê de dê çi qewimînên baş çêdibin? Ez bi xwe tênagihêjim. Dil dixwaze ku ev gotin û nirxandinên erênî encameke erênî bi xwe re bînin, lê bi daxwaza dil tenê tiştek naçe sêrî. Ji bo ku bi rastî mirov hêvîdar bibe, divê serê pêşîn ev êrîşên li ser hêzên gerîla û siyasetmedarên kurd rawestin. Lê mixabin tiştekî wiha xuya nake, li şûna wê dixwazin bi hinek "gavên yekalî" qaşo kêşeyê çareser bikin. Çi ne ew gav? Dê nivîsên bi rengê "Çi berxtewar e kesê ku dibêje, ez tirk im" ên li ser çiya û baniyên Kurdistanê jê bibin. Rê li ber weşana kurdî ya radyo û televizyonan vekin û belkî kurdî li dibistanan bikin "waneya vebijêrkî".

Lê her kes dizane ku bi van tiştan tenê çareserî pêk nayê. Divê serê pêşîn rê li ber kuştinan were girtin. Heta ku di vî warî de gavin neyêne avêtin, tiştek çareser nabe. Ez der barê gavên din de zêde tiştekî nabêjim, lê belê mijara "waneya vebijêrkî" girîng e. Ez bi xwe vê yekê wekî dafikekê dibînim, ne wekî çareserî. Em carinan dibînin ku hinek siyasetmedarên kurd jî vê yekê wekî çareserî pêşkêş dikin. Em ji wan tika dikin ku nekevin vê dafikê. Lewre em perwerdehiya bi kurdî dixwazin, heta ku ev yek pêk neyê, kurdî azad nabe. Heta ku kurdî azad nebe têkoşîna parastin û pêşvebirina kurdî dê bidome.

Ev dema ku em tê de pir girîng e, divê em gelekî hişyar bin. Dewleta "Alî Osman" bi dek û dolabên xwe navdar e. Ew dikarin me bi gotinên xweş sist û şimaqê li bin guhê me bidin. Em ji bîr nekin ku rayedarên tirkan xwediyê ezmûngeriya bi hezaran salan ên desthilatiyê ne. Kalikên wan di dema Selçûkiyan de li ber destên farisan perwerde bûne, di dema Osmaniyan de jî hînî dek û dolabên Bîzansiyan bûne. Ji ber vê yekê divê em hay ji xwe hebin û heta ku em tiştina bi çavên serê xwe nebînin, ji "gotinên xweş" bawer nekin.




# Zimanê dayikê

**Zimanê zikmakî; di ruhê mirov de, di mejiyê mirov de, di bîra mirov de, di kesayeta mirov de xwedî hêzeke bi taybet û bi sêhr e. Raman û ziman ji hev cuda nabin. Ziman raman pêşve dibe, raman jî ziman pêşve dibe**

MEHMET ŞAHÎN

Zimanê ku li ser axa cîhanê hene her yek danehevên neteweya xwe bigihîne qirnê nû û amûrekî herî girîng e. Ji ber ku ew zimanê dayikê ye. Kesayetî, hebûn û domdariya neteweya girêdayî xwedîderketina zimanê zikmakî ye.

Hebûna pir zimanan û cureyên zimanan dewlemendiya xezîneyên ceribandina mirovahiyê ne. Zimanê zikmakî: Ji bo geşbûna mirov, ji bo zanebûn û jîrbûna mirov, ji bo têkiliyeke germ a navbera civak û mirov, pêkereke gelek girîng e.

Zimanê zikmakî; parçeyek çanda mîrov e. Di serî de ji dayik, bav û ji xizmên nêz tê girtin. Piştre jî ew ê ku li der û dor pê re dikevin têkiliyê ji wan tê girtin û bi mirovan re hînbûnek çêdibe. Lewre bi mirovê guherbar re çêbûna bingeha komasiya çandê jî dest pê dike.

Geşbûn û xurtbûna zimanê zikmakî neynika pêşveçûna asta çanda mirov e. Di zimanekî an jî pir zimanan de çêkirina perwerdeyên xurt û dorfireh; ji bo têkiliyên nav civakan û ji bo bi çavekî rexneyî mirov karibe li zimanan binêre şert e.

Di vê çarvoveyê de gerek zimanê ku herî di serî de bê, zimanê zikmakî be. Zimanê zikmakî; di ruhê mirov de, di mejiyê mirov de, di bîra mirov de, di kesayeta mirov de xwedî hêzeke bi taybet û bi sêhr e.

Zimanê me yê kurdî jî; her çiqas di bin zor û zehmetiyan de be jî bi xêzên xwe yên taybet hêza me ya afirîner derdixe holê û tîne ziman. Ji ber ku asta pêşveçûna şaristanî ye û jiyana mirov bêhemdê xwe wê bandor li ser ziman çêkin.

Raman û ziman ji hev cuda nabin. Ziman raman pêşve dibe, raman jî ziman pêşve dibe. Ev rastiyeke zanistî ye. Di xwezayê de destpêka çêbûna şaristaniya mirovahiyê bi têkiliya ziman û ramanê dest pê kiriye. Ew ê ku ramana wî tunebe zimanê wî, zimanê wî tunebe ramana wî tuneye.

Mînaka herî girîng jî sewal in. Ramana sewalan tuneye, ji ber ku zimanê wan tuneye. Ev jî bi me dide zanîn ku ji bo ku em bikaribin ramana xwe û asoya xwe biperisînin hewce ye ku em teqez zimanê xwe biperisînin.

Perisîna ziman darêjtina ziman e. Zimanê ku neyê darêjtin nayê perisîn û nikare hebûna xwe li dijî ziman û çanda serdest bi dirêjayî biparêze. Nikare demeke dirêj xwe ji helîn û windabûnê xelas bike.

Li Rojhilata Navînji zimanên herî kevnar û dewlemendan yek jî zimanê me ye. Hewce ye ku em zimanê xwe biperisînin ku em bikaribin pê re ramana xwe jî biperisînin. Ji bo ku em bikaribin zimanê xwe biperisînin hewce ye ku di serî de em li ser peyvên winda bûne lêkolînan çêkin, peyvên winda bûne an jî hatine jibîrkirin derxin holê û xweşbîniyên wî û rê û rêbazên wî hîn bibin.

Ku em bixwazin ramana xwe biperisînin, hemdem û zanistî bifikirin hewce ye ku em zimanê xwe biperisînin.

Ji ber vê jî em bi israr dibêjin ku hewce ye em bê sekn û bênavber li zimanê xwe xwedî derkevin. Peywira me ya yekemîn û ya herî pîroz hînbûn û hînkirina ziman e.




HAWAR
Aram Basın Reklam ve Yayıncılık Tic. San. Ltd. Şti.
Adına İmtiyaz Sahibi ve Sorumlu Yazı İşleri Müdürü
Bedri ADANIR
Adres:
Kooperatif Mahallesi Gevran Caddesi 1 Geçit. Sarıoğlu Apt. Kat: 4 No:14 Ofis Yenişehir - Diyarbakır
TEL: 0 (412) 229 00 30
Fax: 0 (412) 229 00 39

Baskı (ÇAP):
Stenbol: Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basım, Yayın, Tan. San. Tic. Ltd. Şti. Beşyol Mah. Akasya Sok. No: 23/A Sefaköy - Küçükçekmece İstanbul
Tel: 0 (212) 580 63 80
Edene: Arslan Güneydoğu Gazetecilik, Matbaacılık, Kağıtcılık A.Ş İstîklal mah. İstîklal. Cad. No: 44 Seyhan Edene
Yayın Türü: Süreli

# Weliyên xwendekaran got wisa nabe!

## Çawişê pispor li Amedê bi ser dibistanê de girt xwendekar da ber pehîn û mistan, dev û pozê wî di nav xwînê de hiştin, lê ne Walî û ne jî Midûriyeta Perwedehiyê bertek nîşan da, malbat û mamoste ji vê bi fikar in

Piştî xwendekarê dibistana Seretayî yê bi navê M.B ku ji destê çawişê Pispor E.A lêdan xwar, malbatên xwendekaran ên navçeya Bîsmîlê û Serokê Egîtîm Sena Amedê Abdullah Karahan bertek nîşan dan û bûyer şermezar kirin.

Piştî xwendekarê bi navê M.B ku li Dibistana Baglar a Şehît Albay Dînçer, ji aliyê çawişê pispor E.A ve rastî lêdanê hat, Komeleya Weliyên Xwendekarên Bîsmîlê (OV-DER) bertek nîşan da. Serokê OV-DER Alî Guzey û serokê Egîtîm Sena Amedê bertekên tund nîşan dan û diyar kir ku peywirdarê ewlehiyê yê dewletê bi hêsanî dikeve dibistanê û li xwendekar dixin û ev yek qet nayê qebûlkirin.


Alî Guzey

**Ewlehiya canê me emanetî kî ye?**

Guzay li ser mijarê wiha got: "Ger ku peywirdarê ewlehiyê yê dewletê sûcekî wisa bike, wê demê kî dê canê me û xwendekarê me biparêze. Li hemberî bûyereke wisa qirêj Waliyê Amedê û Midûrê Perwerdehiya Bajêr bêdeng mane. Ev yek nayê qebûlkirin. Em dixwazin der barê vê bûyerê de lêpirsîn were destpêkirin."

**Em ê daxuyaniyekê bidin**

Serokê Egîtîm Senê Abdullah Karahan diyar kir ku ew dê roja duşemê ligel ÎHD û malbata xwendekarê mexdûr a bi navê M.B daxuyanî bidin raya giştî û di daxuyaniyê de bûyerê vebêjin û fikarên xwe bînin ziman û bêdengiya Walî û Midûriyeta Perwerdehiyê ya Amedê rexne bikin.

**Bêdengiya Midûriyeta Perwerdehiyê**

Karahan destnîşan kir ku bêdengiya Walî û Midûriyeta Amedê ya Perwerdehiyê ya li hemberî bûyerê girîng e û divê ev bê vekolîn. Di her rewşa asan û ne asan a perwerdehiya bajêr de berpirsê mijarê saziya Midûriyeta Perwerdehiyê ye. Lê Midûryetê li hember vê êrîşa çawişê pispor bêdeng ma. Em bi fikar in ku di nav demê de mamosteyê dibistanê ku li hember bûyerê pêşî li çawiş girtine û nehiştine bûyerek hê xirabtir biqewime rastî lêpirsînê bên. Balkêş e ku çawiş hevaleke xwe jî girt gel xwe û bi ser dibistanê de girt û xwedekar da ber pehîn û mistan.

**Bûyer çawa pêk hatibû?**

Xwendekarê pola 6'an O.A. ku bavê wî çawişê pispor e ligel xwendekarê pola 6'an M.B., li baxçeyê dibistanê dilîzin û li hev didin. Piştî mamoste dikevin navbera zarokên xwendekar wan ji hev diqetînin. Piştî vê bûyerê bavê O.A dibihîze ku kurê wî şer kiriye êrîş dike ser dibistanê. Çawişê pispor E.A. bi cilên xwe yên leşkerî digire ser dibistanê û xwendekarê bi navê M.B.ji polê derdixe. Çawişê pispor, xwendekarekî dişîne polê û dibêje "Midûr bangî te dike" Piştî xwendekarê pola 6'an M.B ji polê derdikeve rastî êrîşa çawişê pispor E.A tê. Piştî xwendekar M.B rastî êrîşê tê dike qêrîn û hawar û li ser vê yekê rayedarên dibistanê bi gaziya wî tên. Rayedarên dibistanê vê bûyerê bi telefona destan dikişînin kamerayê.

Piştre jî bavê xwendekar M.B. Abdullah B. der barê çawişê pispor de serlêdana dozê kir. **AMED / DÎHA**

# 'Ulkucu bi lîncê me tehdît dikin'


Vahdettîn Demîrat

Li Sakaryayê ku bi teşebûsên lînca li hemberî kurdan her tim di rojevê de ye, xwendekarên kurd jî dan zanîn her tim rastî pêkutiyan û teşebûsên lîncê tên. Xwendekarê Zanîngeha Sakaryayê Vahdettîn Demîrat, destnîşan kir ku xwendekarên kurd her tim rastî êrîşên ulkuciyan tên û derbirî ku rêveberiya dibistanê û peywirdarên ewlekariyê jî vê yekê ji nedîtî ve tên. Demîrat, anî ziman ku di 20'ê gulanê de ji aliyê ulkuciyan ve rastî teşebûsa lînckirinê hatiye.

Li Sarkaryayê teşebûsên lîncê, pêkutî û gefên li hemberî kurdan ji rojevê nakevin. Piştî teşebûsa lîncê ya par li hemberî kurdê ji bo komkirina findiqan hatin, êrîşa li dijî xwendekarên tîşortê Ahmet Kaya li xwe kirin, mirinên di encama pevçûna bi çek a di navbera Tarik Ekîncî û Serokê Ocaxa Ulkuciyan de pêk hatin, êrîşa li Akyaziyê li hemberî 2 birayên hev ên kurd û kuştina Savaş Guler, xwendekarên kurd ên Sakaryayê diltir in. Xwendekarê Beşa Têkiliyên Navneteweyî yê Zanîngeha Sakarya Vahdettîn Demîrat (26), diyar kir ku li yurda li cem Kampusa Esentepe ya lê dimîne şeva 20'ê gulanê ji aliyê ulkuciyan ve rastî gefan hatiye û da zanîn bi teşebûsa lîncê re rû bi rû maye. Demîrat, derbirî ku 16'ê gulanê dema ulkuciyan li bexçeyê yurdê bernameyek li dar xistiye xwendekarê kurd ê bi navê Taylan Dede ji ber sedemek nayê zanîn rastî êrîşa ulkuciyan hatiye û wiha dom kir: "Di dema bûyerê de xwendekarê bi navê Mehmet Yildiz jî dibêje 'Li vir tu kes ne bêxwedî ye, hûn nikarin li tu kesî bidin' û li Dede xwedî derdikeve. Piştre peywirdarên ewlekariyê ketin navberê Dede û Yildiz. **SAKARYA**

# Sînevîzyonê kesên bin çavan de hatine windakirin hat nîşandan

Şaxa Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) ya Enqereyê bi munasebeta 'Hefteya Windayan' ji wêne û dîmenên kesên di binçavan de hatine windakirin sînevîzyonek pêşkêş kir.

Şaxa ÎHD'ê ya Enqereyê, bi munasebeta 17-31'ê Gulanê 'Hefteya Têkoşîna li Hemberî Windayiyên di binçavan de ya Navneteweyî' li Kolana Yuksel li ber Abîdeya Mafên Mirovan sînevîzyona ji wêne û dîmenên windayan pêk tê pêşkêş kir. Di bîranînê de nûner û rêveberên DTP, SDP, ESP, Kurd Derê û saziyên sivîl ên civakî amade bûn. Di bîranînê de pankarta "Bila winda bêne dîtin û kiryar bêne darizandin" hate vekirin. Beriya destpêka sînevîzyonê helbestvan Mehmet Ozer, diyar kir ku siyaseta serdest di hemû serdeman de polîtîkaya tunekirin û windakirinê li hemberî muxalefetê dimeşîne. Ozer, da zanîn ku li Tirkiyeyê piştî sala 1980'an winda zêde bûne û gihîştiye asta herî jor. Ozer wiha got: "Ev 25 sal in mirov li Tirkiyeyê têne windakirin. Em heta niha ji zarokên xwe û xizmên xwe yên winda agahî nagirin. Heta ku winda neyên dîtin aramî pêk nayê. Hîn jî çavên dayik û bavan li riya zarokên wan e."

Piştî axafatinê pêşandana slayta ku ji wêne û dîmenê windayan pêk dihat hate nîşandan. Di pêşandana slaytan de dîmenên hestiyarî hatin pê. **ENQERE**

## Li Geverê êrîşa çekdarî: Polîsek mir

**COLEMÊRG**

Li navçeya Gever a Colemêrgê polîsekî rastî êrîşa çekdarî hat jiyana xwe ji dest da. Li gorî agahiyan, polîsê bi navê Metîn Batak û mamosteyê bi navê Ulku Kaplan ku li navçeyê peywirê dike di derengiya şevê de li nêzî Otela Osla ya li Kolana Cenîz Topel a Geverê rastî êrîşa çekdarî hatin. Metîn Batak ku di encama êrîşê de bi giranî birîndar bû dema bi helîkopterê rakirin Wanê di rê de jiyana xwe ji dest da. Ulku Kaplan jî birîndar bû li nexweşxaneyê tê tedawîkirin. Lêpirsîna têkildarî bûyerê didome.

## Li Patnosê qeza: 17 kes birîndar bûn

**AGIRÎ**

Li Navçeya Panosê ya Agiriyê servîsa xwendekaran û traktor li hev qelibîn. Di encama qezayê de 15 jî xwendekar 17 kes birîndar bûn. Mînîbusa bi plaqeya 04 AY 937 ku ajokariya wê M.S.A. dikir û ji bo gerê xwendekar ji Agiriyê dibirin Wanê, li nêzî Panosê bi traktora Î.A. ajokariya wê dikir ya bi plaqeya 04 P 2328 re li hev qelibîn. Di encama qezayê de ajokarên wesayîtan û 15 xwendekar birîndar bûn. Ji xwendekarên birîndar 13 kes rakirin Agiriyê û 2 jî sewqî Wanê bûn. Ajokarên wesayîtan jî piştî li ser piyan hatin dermankirin hatin binçavkirin.

# Di çavdêriya 4 leşkeran de ameliyat kirin

**A. CAN DEMÎR** / ÎZMÎR - ANF

Girtiyê bi navê Ugur Yildirim ameliyata apandîsê di çavdêriya 4 leşkeran de û bi destê kelepçekirî ultrasyon hat kişandin heta li ser masa ameliyatê hat razandin jî destê wî nehatin vekirin.

Herî dawî ev jî bû: Di ameliyata girtî de 4 leşkeran kirasê spî li xwe kirin û ligel doktoran man. Heta girtî li ser masa ameliyatê nedan razan kelepçe vekirin.

Ev mehek e ku Yildirim di girtîgeha Tîpa F a 1'emîn a Kiriklarê de girtiye. Roja 15'ê gulanê saet di 21.30'an de êşên dijwar lê peyda bûn. Bijîşkê girtîgehê li nexweşxaneyê bi hinceta nexweşiya apantêzê rapor da ku abûlans bê.

**Nexweş bi rîngê rakirin**

Ancax nexweşê giran Ugur Yildirim ligel rapora doktor di cihê ambûlansê de rîng hat Yildirim birin nexweşxaneya dewletê ya Yeşîlyurtê. Yildirim êşên ku di nav rîngê de kişand ji parêzerê xwe Canan Uçar re wiha vegot: “Ji ber êşa zik ez bêmecal ketim û ne bijîşk, ne heval û ne kes li wir bû, min got ev hew dijîm dimirim.”

Ultrasyona girtî dema hat kişandin jî kelepçe nehat vekirin. Bi kelepçê birin oda ameliyatê û ancax dema dest bi ameliyatê hat kirin kelepçe hat vekirin.

Hevkariya bijîşk û leşker ne li gorî sinc ango etîka hekîmiyê û perwerda tibî ya navneteweyî ye. Li gorî peymana perwerdehiya tibê ya navneteweyî divê kelepçe neyê kirin. Li Tirkiyeyê ji kelepçeyê wêdetir 4 leşker jî dema ameliyat bi kirasên spî yê bijîşk di odeyê de cih girt.

**Di qawişa girtiyan de îşkence**

Di cihê ameliyata Yildirim de 7 kêl hebûn û hê ji bin bandora narkozê dernekêt ew avêtin qawişa mehkûman. 2 saet û nîv hewl da ku ji bandora narkozê rizgar bibe. Girtiyên edlî xwestin pêwîstiyên wî bi cih bînin. Lê dema leşker hîn bûn ku Yildirim girtiyek siyasî ye destûr nedan û girtiyên edlî ji wê odê derxistin.

**Pêşî li tîrojên rojê jî digirin**

Parêzerê Yildirim û endamê rêveberiya ÎHD'ê Canan Uçar diyar kirin ku qawişa nexweşxaneya dewletê ya Yeşîlyurtê wek bîrê ye û ev şert û merc ji bo nexweşan ne guncan e. Ji bo girtiyên siyasî jî pêşdaraziyeke mezin heye û Ucar got ku gelo çima nehiştin alîkarî bidin Ugur?”

Parêzer jî diyar kir ku mevzuata heyî ne li gorî etîka tibê û hekîmiyê ye. Divê di demeke nêz de ev bê sererastkirin.

# ÎHD'ê piştgirî da tamîliyan

Şaxa ÎHD'ê ya Stenbolê, ji bo gelê tamîlî ku rastî komkujiya hikûmeta Srî Lankayê hat banga piştgiriyê kir.

Endamên Şaxa ÎHD'ê ya Stenbolê ku li Parka Gezî ya Taksîmê hatin cem hev, komkujiya hikûmeta Srî Lankayê ya li hemberî gelê tamîlê şermezar kirin û banga hîstiyariyê li raya giştî ya cîhanê kirin. ÎHD'iyên ku pankarta "Em komkujiya li hemberî gelê tamîlê şermezar dikin" rakirin, sloganên, "Bijî biratiya gelan", "Gelê tamîl ne bi tenê ye" avêtin. Rêveberê Şaxa ÎHD'ê Ahmet Taner, da zanîn ku ji sersalê heta niha 7 hezar sivîl hatine kuştin û 250 hezar sivîlên tamîlî bûne penaber, xwest dest ji polîtîkaya tunekirinê ya li dijî gelê tamîlê bê berdan. Taner, derbirî ku ji daxuyaniyên Serokomar Abdullah Gul ên ji van pêşketinan kêfxweş xofê digirin û wiha got: "Hemû gelên ku Peymana Medenî û Mafên Siyasî ya Neteweyên Yekbûyî qebûl kirine mafê wan heye ku qedera xwe tayîn bikin. Her wiha dikarin statuya xwe ya siyasî bi hêsanî diyar bikin. Lê ev pîvan bi şiklekî hovîtî hatiye binpêkirin." Taner, derbirî ku tenê ji bo gelê tamîlê bikaribe jiyana xwe îdare bike alîkarî tê dayîn û bêdengiya raya giştî ya cîhanê ya li hemberî vê yekê rexne kir. Taner, bang kir ku piştgiriyê bidin gelê Tamîlê. **STENBOL / DÎHA**



# Beriya 1'ê hezîranê hişyariya dawî hate kirin

Serokatiya Konseya Rêveber a Koma Civakên Kurdistanê ragihand ku herî dawî li bejahiya Dihê li hemberî kademeya jorîn a Hêzên Parastina Gel operasyonek ji aliyê navenda şer ve hatiye plankirin û di pevçûnê de fermandarê herêmê jiyana xwe ji dest daye. Her wiha hate destnîşankirin ku divê operasyonên îmhayê yên li hemberî hêzên PKK'ê bên bidawîkirin û wiha hate gotin: "Di vê mijarê de em hikûmet û artêşê cara dawîn hişyar dikin."

Serokatiya Konseya Rêveber a Koma Civakên Kurdistanê, bal kişand ser êrîşên ku piştî 29'ê Adarê hilbijartinên herêmî zêde bûne û got beriya 1'ê hezîranê tu gavên pratîk nehatine avêtin. Daxuyanî wiha domiya: "Rewşa siyasî ya piştî hilbijartinên herêmî 29'ê Adarê, ji bo çareseriya pirsgirêka kurd bi riyên demokratîk bê çareserkirin hawirek erênî çêbûye. Ji bo pirsgirêka kurd bi riyên demokratîk û aştiyane bê çareserkirin ji 13'ê nîsanê heta 1'ê hezîranê biryara bêpevçûnê ya yekalî me ji raya giştî re aşkera kir. Piştre ji bo çareseriya pirsgirêkê pêşniyarên herî maqûl me vegotin. Ji bo pirsgirêka kurd bi riyên demokratîk û aştiyane bê çareserkirin çi ji destê me hat me kir û em dikin jî."

**Dewletê li ser çi li hev kiriye?**

Di daxuyaniyê de hate destnîşankirin ku li hemberî tevgera demokratîk a kurd operasyona bêbandorkirin û tasfiyeyê di qada siyasî de hatiye destpêkirin û bal kişand ser gotinên Gul ên ku cara yekem di nava saziyên dewletê de lihevkirinek pêk hatiye. KCK'ê wiha got: "Li hemberî van hewldanên me ku gelê me û raya giştî ya cihanê dişopîne, ji bilî hin daxuyaniyên serokomarê Tirkiyeyê Abdullah Gul ên der barê çareseriyê û hebûna pirsgirêkê de, tu gavên berbiçav nehatine avêtin. Di pêvajoya van daxuyaniyên hatiye dayîn de, êrîşên li ser gelê me zêde bûne, ciwan hatine qetilkirin, hatiye xwestin ku serê zarokên me bê pelçiqandin, operasyona bêbandorkirin û tasfiyekirina qada siyasî ya li hemberî DTP'ê hatiye destpêkirin."

**'Fermandariya herêmê hedef girtin'**

Di daxuyaniyê de li ser operasyonên dawî jî hate sekinîn û der barê şehadetên li qada Dihê û Çiravê de ev agahî dan: "Artêşa Tirk di 15'ê gulanê de li çiyayê Çiravê yê Şirnexê operasyonek da destpêkirin. Di operasyonê de 6 şervan hatin qetilkirin û gelek windahiyên aliyê dewletê jî hene. Herî dawî li qada Garisa ya Dihê li hemberî kademeya jorîn a hêzên gerîla operasyona navendî ya plankirî bi her cureyên teknîkê di 17'ê gulanê de komek gerîlayên me ku di nav de Fermandarê Herêma Garisa Şervan Sason (Niyazî Akin) jî hebû şehîd ketine. Her wiha niha li Botanê û gelek cihên Kurdistanê operasyonên leşkerî berdewam dikin. Biryara tevgera me ya bêpevçûnê ji xwe re weke fersend dîtin û teknolojiyeke mezin bi kar tînin. Fermandarê herêmê Şervan Sason, fermandarê bolukê Celal Şervan, fermandarê taximê Canxurt Afrîn û şervan Koçer Kurdo jiyana xwe ji dest dane."

Di daxuyaniyê de artêş û hikûmet bi awayekî tund hatin hişyarkirin: "Em bi awayekî aşkera dibêjin, aştî û çareserî yekalî nabe, ancax beranberî hev dikare were bipêşxistin. Lê wisa tê fêmkirin ku bi bikaranîna teknolojiya herî dawî dixwazin operasyonên îmhayê berdewam bikin. Em cara dawîn hikûmet û artêşê hişyar dikin. Em ji raya giştî re radigihînin ku ji kuştinên derkevin holê em ne berpirsyar in. Em di serî de bang li hêzên demokrasiyê yên Tirkiyeyê û rewşenbîran dikin ku vê daxwaza dilsozane ya Rêbertiya me, gelê me û tevgera me bê dîtin, ji bo rawestandina operasyonên îmhayê bikevin nava hewldanan, dewlet ji bo çareseriya demokratîk gavên ku gelê me tatmîn dike gavên berbiçav biavêjin û li her cihî heta 1'ê hezîranê çalakiyên demokratîk bi pêş bixin û rê nedin rantxurên şerî." **BEHDÎNAN / ANF**

# Ji keleha Wanê banga aştiyê




**Hevserokê DTP'ê Ahmet Turk li Wanê bangî raya giştî ya demokratîk kir ku li hemberî pêvajoyê hesas tevbigerin. Turk ji rayedarên dewletê re got, divê gavên şênber bên avêtin**

Hevserokê DTP'ê Ahmet Turk ku di mitînga "DTP'ê bêdeng nekin, çekan bêdeng bikin, bersivê bidin biryara bêpevçûniyê" ya bi tevlêbûna zêdetirî 100 hezar kesan li Wanê hate lidarxistin de axivî, bal kişand ku di pêvajoyek şer û aştî tê nîqaşkirin de derbas dibin û da zanîn wekî DTP'ê ji bo çareseriya pirsgirêka kurd berpirsyarî girtine ser xwe. Turk, da zanîn ji bo çareseriyê ev yek bi serê xwe ne bes e.

Hevserokê DTP'ê Ahmet Turk, bal kişand ser nîqaşên li ser çareseriya pirsgirêka kurd tên meşandin û diyar kir ku îro rojek pir girîng e. Turk, destnîşan kir ku li aliyekî pirsgirêka kurd tê nîqaşkirin û li aliyê din operasyon dom dikin. Turk, anî ziman ku di vê pêvajoya nîqaşên pirsgirêka kurd de li Licê, Gabar, Kato û gelek deverên din operasyonên leşkerî têne meşandin. Turk, wiha axivî: "Di rojên borî de jî heman tişt pêk hatin. Bi operasyonan çareserî pêk nayê. Wê demê jî gelê kurd serî li hemberî van êrîş û operasyonan danenî, niha jî em serî li hemberî van êrîşan natewînin." Turk, bal kişand ser biryara PKK'ê ya rawestandina pevçûnan û axaftina xwe wiha domand: "PKK'ê got 'ji bo aştiyê û çareseriyê em hene'. Got 'em ji bêdengiya çekan re hene'. Ji bo çareseriyê jî Îmralî û Ocalan wekî navnîşana çareseriyê nîşan da. Dîsa DTP wekî navnîşana çareseriyê nîşan da. Daxuyaniya PKK'ê ya ji bo aştî û çareseriyê jî dil e."

**'Xewna me aştî û demokrasî ye'**

Turk, ji bo aştî û demokrasiyê bang li hemû kesî kir û wiha axivî: "Em wekî DTP'ê dikevin bin berpirsiyariya aştiyê. Lê belê çareserî tenê bi me çênabe. Herî dawî me bi Serokomar Gul re hevdîtin çêkir. Me ji Gul re jî got werin berpirsiyariyê bidin ser xwe û em bi hev re vê pirsgirêkê çareser bikin. Ev pirsgirêk tenê bi aliyekî çareser nabe. Ji bo çareseriyê divê têkoşînek hevbeş pêk were." Turk, bang li CHP'ê jî kir ku berpirsiyariya xwe bi cih bîne. Turk, ji CHP'ê xwest ku berpirsiyariya xwe ya li hemberî gel pêk bîne û got: "Baş zanibin ku nasname û zimanê vî gelî nayê tunekirin. Gel her tim li nasname û zimanê xwe xwedî derketiye û dê dîsa xwedî derkeve. Werin em bi hev re bi riyên demokratîk pirsgirêkê çareser bikin."

Turk, bal kişand ser rewşa parlamenterên ku der heqê wan de fezleke hatine dayîn û ji bo îfade bidin biçin dadgehê. Turk, li ser rewşa dawî jî wiha got: "Em li ser pişta kêrê dimeşin, em di pêvajoya ku şer û aştî tê nîqaşkirin de derbas dibin. Êdî heyfa welat, kurd û tirkan e. Hûn nikarin vê pirsgirêkê bi Amerîka, Yekîtiya Ewropa û Iraqê re çareser bikin. Muxatap diyar in. Hûn îro li qadan daxwazên xwe tînin ziman. Çareseriya pirsgirêkê ev qad e." **WAN / DÎHA**

## 'DTP'ê bêdeng neke, çekan bêdeng bike'

Mitînga "DTP'ê bêdeng neke, çekan bêdeng bike, bersivê bide bêpevçûniyê" li Parka Kultur a li cem Keleha Wanê pêk hat. Mitîngê bi meşeke girseyî dest pê kir. Ji bo meşa ku ji aliyê jin û ciwanan ve ji di noqteyên cuda hate destpêkirin, di saetên sibehê de gelek kes li ber Duryana Pisîkê li ser riya Îpek û Nexweşxaneya Alman hatin cem hev. Piştî ku gelek kesên ji bajarên din hatin tevî qelebalixa li vir bûn, girse bi pankartên, "Ciwan li hemberî operasyonan mertalê zindî ne", posterên Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan û alên Konfederalîzmê ber bi qada mitîngê ve dest bi meşê kir. Şêniyên taxan jî bi çepikan piştgirî didin ciwanên ji bo PKK û Ocalan sloganan tavêjin. Girseya ku li ber Nexweşxaneya Alman bi pêşengiya DOKH'ê hate cem hev jî, bi slogana "Bijî serok Apo" dest bi meşê kir. Mitînga ku girseyeke qelebalix tevlî bû bi stranên hunermend Peyman Arjin û Hemê Hacî dawî bû.

## 'Gavên stratejîk divên'

Bi zêdebûna nîqaşên li ser pirsgirêka kurd, hîndekar û peywirdarên zanîngehan jî bal kişand ser pirsgirêka kurd. Hîndekarê Zanîngeha 9 Eylul Prof.Dr. Îzge Gunal, diyar kir ku pirsgirêka kurd ne tenê pirsgirêka nijadî ye, her wiha pirsgirêkek çînî ye jî. Gunal, anî ziman ku ji ber DTP'ê bingehek xurt a muxalefetê ye rastî êrîşan tê. Gunal, bal kişand ser çareseriya pirsgirêka kurd jî û ji bo çareseriyê xwest gavên stratejîk bên avêtin.



Prof. Dr. Îzge Gunal, destnîşan kir ku tenê bi gotinên xweş pirsgirêka kurd çareser nabe û xwest dahûrîniyek (fikirandinek) zanistî bê kirin. Gunal, bilêv kir ku 2 tebeqeyên serdest ên di dema Îttîhat Terakiyê de ava bûn û di serdema komarê de jî dom kirin, niha jî ji bo çareseriya pirsgirêka kurd li hev nakin.

**'Dijberan li hev kiriye'**

Gunal, bal kişand ser kevneşopiya CHP'ê jî û wiha got: "Li Tirkiyeyê hêzên serdest ên di dema Îttîhat Terakiyê de ava bûn, heta îro jî didomin. Ev koma ku CHP kevneşopiya wê temsîl dike, dibêje 'li welat aştî, li cîhanê aştî' lê belê di heman demê de li hundir welatê xwe nûnerê şer e. Koma duyem jî koma kevneşopa lîberal e. Dibêje em têkevin Rojhilata Navîn û Qafqasê lê belê lîberal e. Alîgirê firotina her tiştî ye. Lê di bingehê de jî hev cuda nîn in."

Gunal, li ser girseya partiyan jî rawestiya û destnîşan kir ku li Tirkiyeyê tenê bingeh û girseya DTP'ê xwerû û saxlem e. Gonul, diyar kir ku li pey partiyên din girseyek xwedî bingeh tune û wiha axivî: "Girse û bingeha DTP'ê girseyek xwedî sekn, bîrdoz û kedkar e. DTP ji ber helwesta xwe ya aliyê kedê û dijberiya şerîat û xweseriyê ye bûye hedefa êrîşan."

**'Divê baldarî hebe'**

Prof. Dr. Gunal bal kişand ser êrîşan ser DTP'ê û wiha dom kir: "Ger ku DTP'ê li şûna muxalefetê wekî partiyên serdest tev bigeriya rastî êrîşan nedihat. Jixwe wê demê di felsefe û nasnameya xwe dûr biketa. Her wiha dê dengê xwe jî kêm bikirana. Lê belê ji ber ku wekî partiyên serdestan tevnegeriya û li dijî feraset û pergala partiyên serdest tevgeriya û gaveke girîng avêt."

Prof.Dr. Gunal, destnîşan kir ku pêwîst e li derdorê fikrek hevbeş a cîhanê hatina cem hev pêk bê û wiha derbirî: "Divê hikûmeta AKP'ê li ser gotinên Serokomar Abdullah Gul gavên berbiçav bavêje." **ÎZMÎR / DÎHA**

## Beşdariyeke girseyî pêk hat

Bi hezaran kesên ji bo tevlî mitîngê bibin ji bajarên wekî Colemêrg, Mûş, Bedlîs, Qers, Îdir, Erdexan, Erzirom, Êlih, Çewlik, Sêrt û Amedê derketin rê ji bi pankartên xwe cihê xwe li qadê girtin. Hevserokê DTP'ê Ahmet Turk, Parlamenterên DTP'ê Sirri Sakik, Nezîr Karabaş, Hemît Geylanî, Nûrî Yaman, Pervîn Buldan, Fatma Kurtulan, Ozdal Uçer, Sekretera Jinan a KESK'ê Songul Morsumbul, Şaredarê Wanê Bekir Kaya, rêveberên Navenda Giştî ya DTP'ê, Şaredarên herêmê yên DTP'î û serokên rêxistinên bajaran bi hev re ketin qada mitîngê. Heyeta DTP'ê li qadê ji aliyê bi dehezaran kesan ve bi sloganên, "Bijî aştî" û "Bijî serok Apo" hate pêşwazîkirin. Di destpêka mitîngê de ji bo kesên di têkoşîna azadî û demokrasiyê de jiyana xew ji dest dane rêz hate girtin.




## Ji navên Orhan Dogan û Ozgurluk re veto

Li Panosa Agiriyê, biryara şaredariyê ya ji bo navên 2 parkên wekî Parka Orhan Dogan û Parka Ozgurluk bê guhertin ji aliyê qaymeqamiyê ve nehate qebûlkirin.

Meclîsa Şaredariyê ya Panosê, li ser daxwazên gel biryar da ku navên parkên "Selçuklu" û "Osmanli" yên li navçeyê wekî "Orhan Dogan" û "Ozgurluk" bên guhertin. Li Qaymeqamiya Panosê diyar kir ku navên heyî yên parka navên girîng ên dîroka cîhanê û Tirkiyeyê ne û bi îdiaya guhertina navan dê wijdanê neteweyî biêşîne, biryara şaredariyê red kir.

Şaredarê Panosê Yusuf Yilmaz, daxuyand ku ji dema hatine ser peywirê, daxwazên gel ên ji bo guhertina navên her du parkan xelas nebûne û diyar kir ku li ser daxwazên gel mijar anîne rojeva Meclîsa Şaredariyê. Yilmaz anî ziman ku ew ê di biryara xwe de israr bikin. **AGIRÎ**

## Baykal henekên xwe bi kurdî dike

Serokê Giştî yê CHP'ê Denîz Baykal ji bo zimanê kurdî pêşniyareke wisa kir ku kenê mirov pê tê. Li gorî pêşniyara Baykal kurd dikarin bi kurdî daxwazên xwe bînin ziman, lê pêşwazîkirina daxwazên wan divê bi zimanê tirkî be. Wekî mînak: Biçe daîreyeke fermî ya dewletê û bêje; 'rojbaş', peywîrdarên daîreyê ligel ku kurdî bizanibin jî divê bersivê bi tirkî bidin. Ango divê bêjin: 'Gunaydin'.

Baykal ev pêşniyara xwe piştî civîna Lijneya Rêveber a CHP'ê bilêv kir. Ango Lijneya Rêveber a CHP'ê ji bo ku nêrîna xwe ya der barê pirsgirêka kurd de zelal bike civiya ye û di encama civînê de nêrîneke ku Baykal bilêv kir, derketiye holê. Baykal ji bo ku vê pêşniyara xwe bi gelê kurd bide qebûlkirin 27-28'ê gulanê tê Kurdistanê. Baykal dê li bajarên Kurdistanê yên wekî Riha, Mêrdîn û Semsûrê hin hevdîtinan pêk bîne. **AMED**



Cûn

Yaqob Tilermenî
tilermeniyaqob@windowslive.com

# Bijî weşandina pirtûkên kurdî bi keleşwarî!

Li bajarê Mêrsînê, di kolana Pozcu ya bizêv de li kêleka rê sekinîme, li benda hevala xwe me. Di kolanê re lêsiwar weke keriyekî bêserî dane dû hevdu û heta ku şewlên trafîkê veneguherin ser rengê sor, rê nadin peyayan ku derbasî hêla din a rê bibin. Heman çûnûhatin li ser peyarêkê jî karîger e; ji ber nebûna şewlên peyayan a li ser peyarêkan komên mirovan ji du hêlan (rojava û rojhilat) di hevdu re dibuhurin. Tiştê ku bêtir bala min dikişîne, dezgeha li erdê ya ku gelek mirov li ser kom bûne. Ez di navbera lingên mirovan re pirtûkên qalind ên li ser erdê paldayî dibînim. Di heman katê de axaftina min û hevalekê tê bîra min ku em der barê pirtûkên bi keleşî weşandî (korsanwarî) de peyivîbûn. Wê hevalê bi awayekî esehî destnîşan kiribû ku **'pirtûkên kurdî jî fena vanên li kolanan tên firotin bi keleşî neyên çapkirin û bi awayê nihênî neyên firotin, em ê tu carî bi belavbûna pirtûkên kurdî kêfxweş nebin.'** û ew fikra wê bi min jî guncav hatibû.

Belê dîsa kolaneke mezin û bizêv û dîsa pirtûkên keleşwar ku bi ked û tabeke kêm hatine çapkirin û bêyî ku mafê telîfê yê nivîskaran bihesibînin, bi çarîkê heq erzantir têne firotin. Ligel ku ez jî li dijî karekî wiha yê bêxîret derdiketim, min jî gelek caran weke gelek xwîneran ew guneh kiribû û pirtûkên qalind ên ku li pirtûkfiroşan bi qasî heqê pênc pirtûkên korsan kirîbûn. Belê! Pirtûkên ku bêtab û bêsab tên çapkirin û bi çarîkê heq têne firotin û dilnuwaziya kirînê bi xwînerên rasteqîn re çêdikin, ez jî ber bi xwe ve kişandibûm û min yekser rahiştibû pirtûka *Elif Şafak* a bi navê *Aşk* û pirtûka *Vedat Turkali* ya bi navê *Yalancı Tanıklar Kahvesi*. Her du roman jî berî bi hefteyekê derketibûn peyaseyê û hîna keldûmana ser çapa wan bi giştî ji ser wan bi hewa neketibûn. Ev çawa xîret bû ku di navbera çend rojan de lasayiyên wan gihîştibûn ber destê mirov! Elif Şafak'a ku bi her weşandina romaneke xwe pirtûkên wê dikeve rêza pêşîn a firotinê, ji bo keleşkaran qumaşekî zêrîn bû; lê Vedat Turkali'yê sosyalîst ê nod salî! Qey van bazirganan dizanîbûn ku mirovên herî bêtir ji xwendinê hez dikin, kesên çepgir û mixalif in; ango sedemeke dîtir…

Dema mijar der barê weşandin û çapkirina berhemên hunerî bi rêbaza keleşwarî de be, mirov bi tundî dikarin helwest û bertekên dijber rê bidin; mixabin dema mirov bi baldarî li weşandina pirtûkên kurdî dinihêre, bi hêsanî dibîne ku ji serî heta binî çalakiyeke kedxwar û nelirê heye. Weke *Lichtenberg* berî bi dehan salan rave kiriye û gotiye, *"Li cîhanê ne gengaz e ku ji pirtûkan ecêbtir alavên firotinê hebe: Ji teref kesên famkor têne çapkirin, ji teref kesên famkor têne belavkirin, ji teref kesên famkor têne xwendin û tew têne rexnekirin û nirxandin jî; û van deman ji teref kesên famkor têne nivîsandin."* li hemû beşên karkirinê keleşwariyeke dewlemend li hemberî pirtûkên kurdî derdikeve pêşiya mirov û tew mirov nizane wê ji ku derê dest pê bike û serî hilde. Û nizane wê ji kê dest bi tawanbariyê bike ku mafê nivîskaran bi beleşwarî dixwin. Yanî şoreşgeriya di vî warî de jî pereyan nake. Ji ber ku nivîskar bi her awayî bêçek hatiye hiştin. Jixwe nivîskarên xwedîpeyv û xwenas hay ji hemû dek û dolabên weşangeriyê hene û tu carî serî li ber tu kesî natewînin û zanibin dê tu carî berhemên wan çap nebin jî, dev ji çalakiya xwe ya nivîsînê bernadin, serî li hemberî zemên radikin û gotinên feylesof *Schopenhauer* pesend dikin: *"Her wextî du celeb wêje hene: Wêjeya yekem li hemberî zemên serî radike û vediguhere wêjeya mayînde. Bi vêya mirovên ku ji bo huner û zanistê dijîn, mijûl dibin; dilgiran û bêdeng, lê bi hêdîkayî di riya xwe de dimeşin. Bi wêjeya dîtir jî kesên ku jiyana xwe di ser huner û zanistê re dibuhurînin, diştaxilin; ev bi çepik û heytehola terefgirên xwe bi çargavî pêş ve diherin. Piştî çend sal derbas dibin mirov ji xwe dipirse, 'Li ku ne vana? Bi ku de winda bû şohreta wan?'…"*

Her ku pirtûkên kurdî ji bo çapkirinê bi şertên dijwar re rû bi rû dimînin û gelek caran riya çapkirinê ji xwe re nabînin, civak bêtir di yekrengî û yekdengiya xwe de dîl dimîne. Faşîzm bi ser dikeve! Ji lewre wêje ji yekjimariyê ber bi pirjimariyê ve dibe. Di navbera gelan de gelek piran ava dike. Dengan li hev vedigerîne, rengan li hev zêde dike. Warekî ku wêje lê bi cih nebûbe, li wî warî faşîzm aj dide. Çinku li wê derê yekdengî û yekrengî hikum li ser hişmendiya civakê dike. Ji ber hindê wêjeya ku dimîne ji zemanê dahatûyê re, ji ber şert û mercên neyînî yê çapkirin û weşandinê carinan di nava rûpelên girtî yên rabirdûyê de dimînin û nagihîjin girseya xwe. Bi van sedeman jî, mirov carinan xweziya xwe tîne û dirûşmeyan diqîre û dibêje, bijî weşandina pirtûkên kurdî bi riya keleşwarî!..



Peyvdank

Berken Bereh
berkenbereh@hotmail.com

# Helbest û berxwedêrî

Helbest, qîrîn û hawareke ji dil e. Raperîn e, li hember stemkar û desthilatdarên jehra xwe dixin şaneya jiyana me, qeyd û bendan ava dikin ji bo me. Lew, ev helwest berpirsyariya helbestê ye. Divê bi cesaret be û di nav livbaziyê de be, welew li ser riya wê bi sedan cinawir hebin jî. Bedeng bûn îxaneta helbestvaniye ku helbesta xwe bi xwîna xwe dinivîse. Tercîha wî ne rîsk û xetereyên jiyanê lê, heyata di nav van xetereyan de veşariye. Ev, bîr û boçûn dê bawerî û cesaretê bide me. Lê li hember kê û çawa?

Li hember wan ên rabûn û rûniştiname bi qeyd û bend dikin, li hember zalim û şerxwazan, li hember pergala hov a kapîtalîstan, li hember nejidilbûna helbestvanan, li hember kesên berpirsiyarî û hişmendiya me şêlû dikin. Ev prensîb û çalakvanî wê me wêrektir û berhemdartir bike. Ne ku ez dixwazim ji helbest û helbestvanî re pênasiyekê vebêjim an helbestê têxim bin barê siyaset-şerî. Armanca min ev e ku vegotineke cuda bibêjim û helbest û qada helbestê bi awayek din şirove bikim û wê bidim ber şûrê pirsan.

Ev şîrove bê guman bi prensîbên estetîkê, li hember mîrîtiya helbestvan û helbesta pişta xwe dayî jiyanê û bûyer û qewimînên civakî piştguh dike ye. Ger helbestvan bide dû bîrdoziya xwe û helbestê bike alaveke wê, dê berhem an helbesta wî bi kêrî tu tiştî neyê. Divê bîrdoziya wî wek şekirê di nav çayê de be; nexuye, lê tahmekê bidê. Berevajî, an dê helbest bibe qurbana bîrdoziyê an jî ew pencereya resen (bîrdozî) dê hilweşe. Em baş zanin ku helbestek dûrî jiyanê tune ye. Kesên helbestê ji jiyanê dûr dixin, bûne dîl û êxsîrê azweriyên xwe. Ev nîşaneya jiyan û helbesta têkçûyî, romatîzmeke pirole ye.

Em dost û evîndarê helbesta pala xwe dayî heyatê ne. Ev hişmendî nîşaneya hevalbendî û hogiriya me ya bi kesên tûşî zilm, stemkarî û neheqî li wan tê kirine. Ev jî tê wê wateyê ku em helbestê tenê ne wek tişteke dilînî lê, her wiha wek helwestekê jî dihizirin.Çi ye ev helwesta helbestê? Berê her tiştî helbest derbirîna rastîhevhatinê ye, ya bi dinyayê, bi insan û civakê, bi hest û hişî, bi heyat û mirinê re ye. Vegotina vê rasthatinê berê her tiştî hem di helbestê de û hem jî bi peyama xwe ya raberî xwendevanî dike de jidilbûn e. Helbestvanê vê jidilbûnê dayî helbesta xwe, di têkiliyên civakî de jî xwedî heman tevger û livbaziyê ye. Ango di her şert û mercê de ahengbûna hest-raman û heyatê pîvana jênager ya ji dil bûnê ye. Ev sedsala ku jê re şaristanî tê gotin di her kêlika jiyanê de dûrûtiyê li ser me ferz dike. Rûpoşekê dide me, da em xwe bi wê bixapînin û sebra xwe pê bînin. Gelek caran em rûdan û qewimînên barbar, nabînin, nabihîsin û em bêhna şewata li ber deriyê xwe nahisin. Ev jî me dirizîne, ji pûxteya mirobûnê dûr dixe û dejenere dike. Helbestvan bi vê genîbûn û dûrûtiyê dihese û bi helbesta xwe ya pala xwe dayî jiyanê "êş"a me û riya bextewariyê li me dide hîs kirin.

Helbestvan li keviya jiyanê dijî lê, reh û rîşalên wî bi jiyanê ve girêdayî ye. Dûrmayîna ji "şaristanî"yê ji xwe re wek derfetekê dibîne. Ji bo berxwedan û têkoşîneke girseyî em dikarin di qada helbestê de ji xwe re derfetan biafirînin. Ger ev helwest pêk bê, roj bi roj dê hem helbesta me û hem jî civaka me tevna xwe raçîne. Ev jî jidilbûn û têkiliyeke xurt ya bi jiyan û civakê ve girêdayî dixwaze.

# 9'emîn Mîhrîcana Çand û Hunerê ya Diyarbekirê

27 Gulan Çarşêm
*Vekirina Pêşangehan*
**Wêne:** Çend Zeman Bihurîn / **Fevzî Bîlge**
Jin / **Rabîha Arslan**
**Cih:** Mêvanxaneya Şaredariya Bajarê Mezin
**Kat:** 10.00-10.30

**Wêne:** Azadiya Li Paş Dîwaran / **Kemal Zengin - M.Alî Yaşa** /
Girtîgeha Tîpa E ya Mêrdînê
Ji Çavên Zarokên Mexmûrî Mexmûr / **Zarokên Mexmûrî**
**Cih:** Galeriya Hunerê - Sumer Park
**Kat:** 10.30-11.00

**Wêne:** Roj / **Haci Çelîk**
**Cih:** Komeleya Çand û Hunerê ya Dîcle-Firatê
**Kat:** 11.30-12.00

**Wêne:** Pêşangeha Wênesazên Hewlêr
**Cih:** Fuara Şaredariya Bajarê Mezin
**Kat:** 12.00-13.00

**Fotograf:** Qerejdax / **Umut Kaçar**
**Cih:** Salona Pêşangehê ya Şaredariya Bajarê Mezin
**Kat:** 13.00-13.30

*Dîwançe*
Ji Bo Biranîna Mamoste Selîm Çevîk
Rengê Me û Dengê Me / **Komeleya Çand û Hunerê ya Dîcle Firatê**
**Cih:** Salona Şanoyê ya Şaredariya Bajarê Mezin
**Kat:** 13:00-15:00

*Şano*
**Kom:** Teatra Perîstan/ Weqfa Çand û Hunerê ya Başak
**Lîstik:** Perîstan
**Cih:** Salona Şanoyê ya Şaredariya Bajarê Mezin
**Kat:** 17.00–19.00

*Bernameya Danasînê*
**Axaftina Vekirinê:** Parêzer Osman Baydemîr / **Şaredarê Bajarê Mezin a Diyarbekirê**
**Pêşandana Sînevîzyonê / Dîmenên Arşîvê yên Festivalê**
**Dîwançe:** Mehmet Akbaş - Ayfer Duzdaş
**Cih:** Anfî Tiyatro - Sumer Park
**Kat:** 20.00-23.00

28 Gulan Pêncşem
*Panel*
**Mijar:** Jin, Namûs, Azadî
**Beşdar:** Çaglar Demîrel / **Şaredara Dêrikê** - Songul Morsumbul / **Sekretera Jin a KESK'ê** - Parêzer Ayla Akat Ata / **Parlamentera Êlihê ya DTP'ê** - Yard.Doç.Nazan Ustundag / Endama Hîndekariyê ya Zanîngeha Bogaziçiyê
**Moderator:** Yuksel Genç / Rojnamevan - Nivîskar
**Cih:** Salona Şanoyê ya Şaredariya Bajarê Mezin
**Kat:** 11:00-13:00

*Dîwana Dengbêjan*
Koma Jinên Dengbêj a Botanê
**Cih:** Mala Dengbêjan
**Kat:** 16.00-17.30

*Pêşandana Belgefîlm*
**Belgefîlm:** Girtîgeha Hejmar 5
**Derhêner:** Çayan Demîrel
**Cih:** Salona Şanoyê ya Şaredariya Bajarê Mezin
**Pêşandan:** 16.00–18.30

*Şano*
**Kom:** Şanoya Bajêr a Trabzon
**Lîstik:** Dengê Der
**Cih:** Şanoya Dewletê ya Diyarbekirê
**Kat:** 19.00–21.00

*Meşa Festivalê*
*'Bi Çand û Hunerê Xeyalên Azadiyê Pêk Bînin'*
**Rêgeh:** Deriyê Riha - Deriyê Çiyê
**Kat:** 19:00-20:00
**Konsêra Vekirinê**
Koma Nûjen
Ozlem Ozdîl
Rojda
**Cih:** Qada Deriyê Çiyê
**Kat:** 20:00- 24:00

29 Gulan În
*Şano*
**Kom:** Teatra Arzeba
**Lîstik:** Name
**Cih:** Salona Şanoyê ya Şaredariya Bajarê Mezin
**Kat:** 14.00–15.30

*Dîwana Dengbêjan*
Dengbêjên Mala Dengbêjan ya Diyarbekirê
**Cih:** Mala Dengbêjan
**Kat:** 14.00-16.00

*Pêşandana Belgefîlm*
**Belgefîlm:** Close Up Kurdistan
**Derhêner:** Yuksel Yavuz
**Cih:** Salona Şanoyê ya Şaredariya Bajarê Mezin
**Pêşandan:** 17.00–19.30

*Şano*
**Kom:** garajistanbul
**Lîstik:** Nûçegihan
**Cih:** Şanoya Dewletê ya Diyarbekirê
**Kat:** 19.00–21.00

*Pêşandana Fîlm*
**Fîlm:** Min Dît
**Derhêner:** Miraz Bêzar
**Cih:** Salona Şanoyê ya Şaredariya Bajarê Mezin
**Pêşandan:** 20.00–22.00

*Dîwançe*
Koma Yekta
Rengîna Mezopotamya / **MKM-Der Edene**
**Cih:** Anfî Tiyatro - Sumer Park
**Kat:** 20.00–23.30

30 Gulan Şemî
*Panel*
**Mijar:** Di Pirsgirêka Kurd de Modela Çareseriya Demokratîk
**Beşdar:** Hatîp Dîcle / **Parlamenterê Kevn ê Depê** - Oral Çalışlar / **Rojnamevan-Nivîskar**
Ufuk Uras / **Parlamenterê Stenbolê yê ODP'ê** - Emîne Ayna / **Hevseroka DTP'ê - Parlamentera Mêrdînê**
**Moderator:** Ayhan Bîlgen / **Sekreteryaya Meclîsa Aştiyê**
**Cih:** Salona Şanoyê ya Şaredariya Bajarê Mezin
**Kat:** 11:00-15:00

*Çalakiyên Zarokan*
**Danîna Qurnefîlan a Zarokan Ji Abîdeya Jiyanê Re**
**Cih:** Parka Koşuyolu
**Kat:** 14.00-15.00

*Şahiya Bafirokan*
**Cih:** Kırklar Dagi
**Kat:** 16.30-18.00

*Pêşandana Dansê*
**Kom:** Civata Dansê ya Mezopotamyayê
**Proje:** Destana Kawayê Hesinkar (Promîer)
**Cih:** Salona Şanoyê ya Şaredariya Bajarê Mezin
**Kat:** 16.00-18.00

*Pêşandana Fîlm*
**Belgefîlm:** Du Ziman Yek Bahol
**Derhêner:** Ozgür Dogan - Orhan Eskîkoy
**Cih:** Mega Center CihneMall
**Pêşandan:** 16.30–18.30

*Meş*
**Rêgeh:** Parkorman- Hemberî Salona Dawetê ya Ava / Dîcle Kent
**Kat:** 18.30-19:30

*Konsêra Girtinê*
Çîroka Rêwitiya Me / **Şahiya Stranan-Hunermendên NÇM'ê**
Koma Muzîkê ya Gose ya Bask
Xemgîn Bîrhat, Peywan Arjîn, Hekîm Sefkan, Zozan / **Hunermendên Akademiya Çand û Hunerê ya Kurd**
Alî Asker
**Cih:** Hemberî Salona Dawetê ya Ava/Dîcle Kent
**Kat:** 19.30–00.00

*Atolye*
**Fotograf:**
**Perwerdekar:** Umut Kaçar-M.Sait Taşkıran
**Cih:** Komeleya Çand û Hunerê ya Dîcle - Firatê
**Mêjû:** 19-25 Gulan
**Şano**
**Perwerdekar:** Muhsin Osman - Durukan Ordu
**Cih:** Salona Şanoyê ya Şaredariya Bajarê Mezin
**Mêjû:** 11-25 Gulan
**Cam-Seramîk**
**Perwerdekar:** Firat Erdogan
**Cih:** Sumer Park
**Mêjû:** 19 Gulan

*Sînema*
**Perwerdekar:** Yeşim Ustaoğlu
**Cih:** Salona Sinemayê ya Burhan Karadenîz
**Mêjû:** 23–24 Gulan

*Def*
**Perwerdekar:** Mamoste Şêrko
**Cih:** Komeleya Çand û Hunerê ya Dîcle – Firatê
**Mêjû:** 04-18 Gulan

*Dansên Gelêrî*
**Perwerdekar:** Osman Bozkurt
**Cih:** Sumer Park
**Mêjû:** 10 - 25 Gulan

✓ Beşdariya meşên festîvalê wê bi cil û bergên gelêrî be.
✓ Fîlm-Belgesel û şano wê bi bilêt bin. Bilêt 2 TL ye.
✓ Hûn dikarin bilêtan ji Gerînendehiya Çandê ya Şaredariya Bajarê Mezin û gîşeyên li Kuçeya Hunerê peyda bikin.



www.arsivakurdi.org

# Li Cannesê çîrokeke trajîkomîk

**Elia Suleyman bi fîlmê Dema Paşvemayî ve balê dikişîne ser pirsgirêka filistîniyan û bi awayekî trajîkomîk pirsgirêkê vedibêje. Fîlm ji bo xelata Palmiyeya Zêrîn têdikoşe û dema mirov li fîlmî temaşe dike ji xwe re dibêje ev der çiqas dişibe Tirkiyeyê**

**MURAT AKTAŞ** - CANNES / ANF

Fîlmê derhênerê filistînî Elia Suleyman ê bi navê Dema Paşvemayî (The Time That Remains) ku li Cannesê ji bo xelata Palmiyeya Zêrîn têdikoşe derket pêşberî sînemehezan.

Di fîlmê Dema Paşvemayî de çîroka malbateke filistînî ji avakirina Israîlê heta niha bi awayekî trajîkomîk tê vegotin. Derhêner Elia Suleyman 7 sal beriya niha bi fîlmê Mudaxeleya Xudayî li Cannesê xelata juriyê ya taybet wergirtibû. Her wiha di fîlmê Dema Paşvemayî de bi awayekî otobiyografiya derhêner û malbata wî cih digire.

Piştî ku bajarê Nazareth ji aliyê israîliyan ve tê dagirkirin hin filistinî bajar terk dikin û hin malbat jî radihêjin çekan û li hember israîliyan şer dikin. Yek jî jê lehengê fîlmê 'Dema Paşvemayî' bavê derhêner Elia, Fuad Suleyman li bajar dimîne û li hemberî Israîlê şer dike. Fuad Suleyman piştî demeke kurt tê girtin û leşkerên Israîlê îşkence li wî dikin û wî di newaleke kûr de diavêjin. Lê Suleyman bi awayekî mucîze ji mirinê difilite û li Israîlê bi cih dibe û dizewice.

Derhêner Elia Suleyman jî wekî zarokê bavekî ku ji mirinê filitiye li Israîlê ji dayik dibe û li vir wekî kêmnetew dijî û perwerdehiya xwe li vir dibîne. Dîrok hatiye jibîrkirin û êdî nîqaşên peyva erebên israîlî dihat kirin. Di fîlm de bi taybet jî dîmenên dibistanê bala mirov dikişîne û mirov ji xwe re dibêje li her derê cîhanê welatên dagirkeriyê dişibin hev û mirov dibêje 'ev der çiqas dişibe Tirkiyeyê'.

**Zarokên dagirkeriyê dişibin hev**

Elia Suleyman wekî hemû zarokên filistînî ku li Israîlê dijîn li dibistanê perwerdehiyeke neteweperestiyê dibîne û bi stranên Israîlê mezin dibe. Elia di zaroktiya xwe de ji ber ku ji Amerîkayê re dibêje 'emperyalîst' û 'dagirker' ji aliyê mamosteyên xwe ve rastî ceza tê. Ew jî wekî bavê xwe bi heman qederê re rû bi rû dimîne.



Derhêner berê kameraya xwe dide kûçeyan û nakokî û têkiliyên filistiniyan ên bi israîliyan re radixe ber çavan. Di vê navberê de bav Fuad her carê cînarekî xwe yê ku derûniya wî xirab bûye û dixwaze xwe bişewîtine ji mirinê xilas dike û wî dibe mala wî. Lê cînarê serxweş her roj di destê wî de şûşê meyê tê derê Fuad û jê re teoriyên xwe yên ku çawa israîliyan ji Filistînê derxin parve dike. Cîranê serxweş ku dema serxweş e ewqas wêrek dibe ku xwe bişewîtine dibêje ger ku hemû ereb wekî min vexwin em ê bi rihetî bikaribin israîliyan ji Filistînê biavêjin. Fuad li bendê ye ku dewama teoriyê bîne lê cînarê wî axaftina xwe bi gotinên 'ji ber ku dema mirov vedixwe tu tiştekî hîs nake' didomîne.

Kameraya Elia Suleyman xemgîniya jiyana rojane ya ku di nav şer û dagirkeriyê de bi diyalogên mirovên jirêzê yên bêwate û axaftinên bi çêr têkçûna mirovan bi awayekî serketî karîkaturîze dike. Fîlm wekî fîlmekî trajîkomîk e lê fîlmekî polîtîk e jî. Tenê ne rojeva nava welat ya derveyî welat jî bala derhêner dikişîne. Di kareyên fîlm de dînemên întîfadayê jî cih digire.

**Çapemenî jî rexne kir**

Zarokên filistînî li hember leşkerên ku kuçeyên wan dagirker kirine li ber xwe didin û keviran diavêjin leşkeran. Leşkerên Israîlê jineke ku di kuçeyê re derbas dibe didin sekinandin û di ser jinikê de diqêrin û dibêjin 'here mala xwe' û jinik jî bi awayekî xwe bawer û bêtirs dibêje 'esas hûn herin mala xwe'. Dîmenên ku di kûçeyên leşker bi çek ve digerin, tank derbas dibin de reqisîna ciwanan ku tu dibêjî qet tiştek nebûye balkêş e.

Derhêner pirsa rojnamegeran ya 'gel ev fîlmekî dîrokî an jî antropolojîk e' bi bersiva 'ez wê analîzê qebûl nakim' bersivand. Derhêner çapemenî rexne kir û bilêv kir ku çapemeniyê dîroka Filistînê ji bîr kiriye û wiha got: "Ger mirov filistînî be ev tê wateya mêrxasî û berxwedanê. Derhêner da zanîn ku li hemberî çapemeniyê her tişt daye ber çavê xwe û xwestiye fîlmekî gerdûnî bikişîne. Derhêner bi fîlmê ku êşa filistiniyên li Israîlê ne tîne zimanli bendê ye ku fîlm îro xelata Palmiyeya Zêrîn werbigire.



## Muptelayê Hibrê



Rênas Jiyan

renasjiyan@yahoo.fr

## Hinekî din yekîtî

Dewletên heyî yên ku kurdan di nav cencereyên xwe de 'çînîçînî' dikin bêyî ku li 'çîn'a ku kurd jê tên binihêrin gişan didin ber xwe û wan di nav diranên xwe de dikeritîne. Di vî nîrî de di nav kurdan de xirûcirên çînî (sinifî) yên weke bûrjûwa û karkeran, feodal û xulaman, dîndar û ne dîndaran; xiriûcirên zaravayî, mezhebî û olî di nav civaka kurdan de nikare çêbibe, û jixwe ne rast e jî çêbibe; ji ber ku pirsgirêka kurdan ji pirsgirêkeke çînî, zaravayî, olî û mezhebî biwirdetir pirsgirêkeke "neteweyî" ye. Ji ber ku li cem dewletên serdest kurdê bûrjûwa û yê karker, kurdê feodal û yê xulam, kurdê dîndar û yê ne dîndar, kurdê Misilman û ne misilman, kurdê sunnî-şafiî û yê elewî-şiî, kurdê kurmanc-dimilî û yê soran-loran giş wekhev in, potansiyel sûcdar in û tavilê divê serê gişan bipelçiqe. Ji ber ku ev nîr nîrekî wiha ye ku hemû kurd di xetereya hebûn û tunebûnê de ne. An ew ê hêza xwe bikin yek û ew ê weke Medan dîsa derkevin ser dika dîrokê, an jî ew ê ji hevdu parçe parçe bin û ew ê der-dîrok bimînin. Heta azadiyê hemû ferq û cudahî divê ji kurdan re heram bin.

Bêyî nav, nasname, nirx, dîrok û serbestiya xwe kurd bûrjûwa bin wê çi ferq bike, karker û cotkar bin wê çi ferq bike; kurd dîndar bin wê çi ferq bike terkesela bin wê çi ferq bike... Jixwe kesê ku dijberî û dijminatiya kurdan dike guh nade rengdêr, çîn, mezheb, ol û zaravayên kurdan, ji wan re kurd be bes e ji bo tunekirin û bêhêzkirinê; ji lew re divê îroj roj ji bo kurdan jî rengdêr, çîn û hwd hûrgilî ne muhîm bin. Kurd çi bin ji kîjan raman, bawerî, rengdêr, sinif û tebeqeyê bin divê di yekîtiyê de karibin hevdu hembêz bikin û bi hebûna xwe hevdu xurt bikin.

***

Heta ku kurd xwe layiqî azadiyê û azadiyê layiqî xwe nebînin dê tu carî azad nebin. Divê kurd tu carî ji bîr nekin ku ew bindest in û zanibin ku bindestî hew bi mûyekî ji koletiyê erênîtir û baştir e. Divê ji bo tu kurdî bindestî tu carî normalîze nebe. Deqeya ku bi xwe derxist ku bindestî di xwe de normalîze kiriye, divê wê çaxê ji hebûna xwe, ji mirovahiya xwe fedî bike û mahdê wî/wê jê bixele, û her tim bizane ku bindestmayîn sûcê wî/wê bi xwe ye.

Gava ku wî/wê alav û argumanên azad ên serdestên xwe bi kar anîn divê zanibe ku ji ber ku wî/wê nikarîbû alavên xwe yên bindest serbest bikira xwe bi bikaranîna alavên azad ên serdestên xwe dixapîne û ber dilê xwe xweş dike.

Heger kurd illeh mecbûr bin ku tiştekî ji xwe re weke qeder hilbijêrin divê ev qeder ne bindestî, azadî be.

*Hinekî din yekîtî...*
*Hinekî din bawerî...*
*Hinekî din Azadî...*

## Li Şanogehên Dewletê bo lîstikên kurdî hêvî

Midûrê Giştî yê Şanogehên Dewletê (DT) Lemî Bîlgen, diyar kir ku dê bikaribin 44 sehneyên li 12 herêman ji bo komên taybet ên şanoyê yên bixwazin lîstikên kurdî bilîzin vekin.

Midûrê Giştî yê Şanogehên Dewletê Lemî Bîlgîn, bi daxuyaniyeke nivîskî diyar kir ku şanoyên taybet li Sahneyên Şanogehên Dewletê bêpere sûd digirin. Bîlgîn, di daxuyaniyê de anî ziman ku komên şanoyê yên ku dixwazin lîstikên kurdî li van sahneyan pêşkêş bikin dikarin sûd ji van salonan bigirin. Bîlgîn, di daxuyaniyê de bal kişand ser Şanogeha Wan û Amedê û wiha got: "Divê em cudatiyê nekin. Şanoyên taybet û komên şanoyê dikarin sûdê ji şanogeha me wergirin.

Wezîrê Çandê Ertugrul Gunay jî, di bersiva da pirsnameya Parlamenterê DTP'ê yê Sêrtê Osman Ozçelîk a têkildarî mijarê de, diyar kir ku bi şiklekî erênî lê dinêrin ku li sehneyên Şanoyên Dewletê lîstikên kurdî bêne lîstin. **STENBOL**

# Ji nû ve 'Şivanê Kurmanca'

Yekemîn romana kurdî ya nivîskarê navdar Erebê Şemo ya bi navê 'Şivanê Kurmanca' ji aliyê Weşanxaneya Lîsê ve piştî 74 salan bi alfabeya Celadet Elî Bedirxan, ligel orjînala wê hate çapkirin.

Pirtûka bi alfabeya latînî ya ku di 1929'an de ji hêla Îsahak Margolovî hatibû çêkirin, di sala 1935'an de ji aliyê Neşra Hikûmetê Rewanê ve hatibû çapkirin. Pirtûk wê di 9'emîn Mîhrîcana Çand û Hunerê ya Amedê de bigihije ber destê xwendevanan. Berhema Erebê Şemo, piştî 74 salan ku Weşanxaneya Lîsê çap dike ji aliyê nivîskar, wergêr û zimanzanê kurd Mustafa Aydogan ve hatiye amadekirin. Pirtûk dawiya gulanê digihije ber destê xwendevanan. Di pêşgotina Mustafa Aydogan de gelek hêlên pirtûkên Erebê Şemo derdikevin ber çavan. Aydogan di pêşgotina xwe ya dûvedirêj de, qala serpêhatiya berhemê dike û wiha dibêje:

"Romana kurdî ya yekem di sala 1935'an de bi alfabeya Îsahak Marogûlov hatiye çapkirin. Piştre ji hêla Î. Orstrogoskaya ve bi zimanê rûsî hatiye wergerandin û Bazîl Nîkîtîn jî ji rûsî ev pirtûk wergerandiye fransî. Nuredîn Zaza jî ev pirtûk ji fransî wergerandiye kurmancî. Yanî Şivanê Kurd weke wergera wergera wergerê hatiye çapkirin û li nava kurdan belav bûye. Zaza dema pirtûk wergerandiye kurmancî nav weke Şivanê Kurd diguherîne. Bi vê çapa Weşanxaneya Lîsê re pirtûk bi zimanê xwe yê ewil jî tê çapkirin û bi navê wê yê orjînal Şivanê Kurmanca derdikeve pêşberî xwendevanan."




'Şivanê Kurmanca' wekî pirtûka weşanxaneya Lîsê ya 75'emîn û wekî 21'emîn pirtûka rêza 'Pirtûkxaneya Ehmedê Xanî' tê çapkirin. **AMED / DÎHA**


# Ciwanan li gundê Sergewra pirtûkxane vekir

Meclîsa Ciwanên Yerel Gundem 21'ê li Amedê di çarçoveya projeya, "Her sal pirtûkxaneyek" li gundê Sergewra Bismilê pirtûkxaneyek vekir.

Meclîsa Ciwanên Yerel Gundem 21'ê li Amedê di çarçoveya projeya, "Her sal pirtûkxaneyek" li gundê Sergewra Bismilê pirtûkxaneyek vekir. Şaredara Bismilê Cemîle Emînoglu, endamên meclisa şaredariyê û gelek ciwan jî beşdarî merasîma vekirina pirtûkaxaneyê bûn. Endamê Meclisa Ciwanên Yerel Gundem 21'ê Hasan Pakdogan diyar kir ku armanca wan heye ku li hemû gundên navçeyên Amedê pirtûkxaneyan vekin. Pakdogan diyar kir ku 600 xwendekarên ji gelek gundan tên gundê Sergewra û ji ber vê yekê li vî gundî pirtûkxane vekirine. Şaredar Emînoglu jî spasiyên xwe ji ciwanan re kirin û diyar kir ku xebatan ji nêz ve dişopînin. Zarokên bi vekirina pirtûkxaneyê şa bûn jî spasiyên xwe ji ciwan û Emînoglu re kirin. **AMED**



# Sersaxî



Savaş Guler

***Savaş Guler li Sakaryayê di encama êrîşeke hovane de ji aliyê faşîstan ve hat qetilkirin. Em ji malbata Guler û gelê kurd re sersaxiyê dixwazin, bila serê gelê kurd sax be.***

**Rêxistinên DTP'ê yên Stenbol, Sakarya, Akyazi, Amed û navçeyên Amedê**

www.arsivakurdi.org

# 3 nivş in li windayan digerin

Dayikên Şemiyê ku cara 217'emîn çalakiya rûniştinê li dar dixin, di çalakiya xwe ya îro de kiryarên Kasim Alpsoy pirsîn. Dayikên Şemiyê ji bo pirsa aqûbeta windayên xwe bikin û bi daxwaza kiryarên bûyeran bên darizandin cara 217'emîn li ber Lîseya Galatasarayê çalakiya rûniştinê li dar xistin.

Xizmên windayan ku di çalakiyê de pankarta "Kiryar diyar in winda li ku derê ne" û wêneyên kesên di demên cuda de hatine windakirin rakirin, xwestin kiryarên Kasim Alpsoy ê di 18'ê gulana sala 1994'an de di binçavan de hate windakirin bên dîtin û dosya tevî doza ergenekonê bê kirin.

**'Bapîrê min li ku derê ye?'**

Parlamenterên DTP'ê Sebahat Tuncel, Gultan Kişanak, şaredara Nisêbînê Ayşe Gokkan, Seroka Giştî ya SDP'ê Fîlîz Koçalî, parazvana mafên mirovan Eren Keskîn, Nivîskar Temel Demîrer, hunermend Zeynep Tanbay û gelek xizmên windayan tevî çalakiyê bûn. Di dema çalakiyê de çalakvanan qurnefîl danîn ser wêneyên windayan. Di çalakiyê de hevsera Kasim Alpsoy, Erdogan Alpsoy, kurê wî Çiya û nêviya wî Bahar Aksoy jî amade bûn.

Piştî Demîrer, lîstikvan Esmeray daxuyaniya vê hefteyê da. Esmeray, diyar kir ku ev 3 nivş in têkoşîna ji bo dîtina windayan tê meşandin û derbirî ku êdî neviyên windayan ji bo pirskirina kiryaran derketine rê. Esmeray, wiha got, "Li pirsa bavê min, kurê min, hevserê min li ku derê ye niha jî bapîrê min li ku derê ye? zêde bû. Bahara 6 salî bi bavê xwe û bapîra xwe re li kalê xwe digere. Kesên ku ji ber şopa keviran a li destê zarokên kurdan bi salan cezayan dibirin, kesên zarokên avêtin bîrên mirinê û winda kirin nabînin. Ji kesên ketin avahiyên ewlehiyê, JÎTEM'ê, MÎT'ê û careke din dernekctin hîn jî agahî nayê girtin."

Esmeray, anî ziman ku hemû serlêdan bê encam mane û da zanîn heta niha der heqê berpirsyaran de heta niha tu lêpirsîn nehatiye destpêkirin. Esmeray, bi bîr xist ku dema Alpsoy hatiye windakirin wê demê Waliyê Edeneyê Nacî Parmaksiz û Midûrê Ewlehiyê jî Ramazan Er bûye û diyar kir ku ji windakirina Alpsoy ew berpirsyar in. **STENBOL**




## Tenê kurê wê piştgirî dayê

**STENBOL**

Karkerên Meyayê 75 roj in li ber xwe didin. Piştî berxwedana 75 rojan mafê xwe wergirtin. Karkera Meyayê N. Degîrmencî, diyar kir ku ji ber berxwedanê her tim di navbera wê û hevserê wê de nîqaş çêbûye û tu carî hevserê wê piştgirî nedayê. Zarokek N. Degîrmencî heye û 2 meh in tevli berxwedana Meyayê bûye. Degîrmencî, destnîşan kir ku her tim jin di plana duyem de ye, lê di berxwedana Meyayê de jin bêtir derketin pêş. Degîrmencî di çarçoveya berxwedana 75 rojan de tevli civîn, panel û şevên piştevaniyê bû û wiha got: "Ji ber xebatan gelek caran di navbera min û hevserê min de nîqaş derdiketin. Min dixwest ku hevserê min alîkarî bide min lê tu piştgirî neda berxwedana me. Her wiha ji ber ku karê malê nedihate kirin her tim aciziya xwe nîşan dida. Berxwedana me deng veda û kargehê gavek paş avêt. Ev tişt ji bo min keyfxweşiyeke mezin e." Tişta herî zêde Degîrmencî keyfxweş dikir pişgiriya kurê wê yê 7 salî Kadîr Degîrmencî bû. Degîrmencî, got ku bi munasebeta çalakiyê gelek hevalên wê çêbûne û hem jî mafê xwe qezenç kiriye.

## Li dijî zewaca bi zorê tedbîr

**ROTTERDAM**

Li Rotterdama Holandayê li dijî zewaza bi zorê xebatek hate destpêkirin. Xwendekarên tirk û fasî dema diçin betlaneyê li welatên xwe ji hêla malbatên xwe ve bi zorê tên zewicandin. Bi hewldana şaredariyê sepandineke nû hate destpêkirin. Xwendekarên ku di dibistanên welatên misilmanan de dê ji rêveberiya dibistanê re peymanekê îmze bike û diyar bike ku ew naxwaze bizewice. Bi wê peymanê xwendekar dikarin mafê xwe biparêzin û polîs dikare der barê malbatan de lêpirsînê bide vekirin. Her wiha hemû xwendekar ne mecbûr in ku vê peymanê îmze bike, kesên ku dixwazin dikarin peymanê îmze bikin. Şaredariya Rotterdamê der barê xebatên xwe de agahî da. Malbatên wekî tirk, fas û pakistanî zarokên xwe bi zorê û di temenê biçûk de dizewicînin û zarokên keçik neçar dimînin ku dest ji xwendinê berdin.

# Dê piştgiriyê bidin mitîngê

Parlamenter Sebahat Tuncel, got ku ji bo şermezarkirina pêkanînên antî-demokratîk ên li hemberî jinên endamên DOKH'ê tên meşandin dê mitîngekê li dar bixin û xwest hemû jin piştgiriyê bidin mitîngê



Parlamenterên jin ên DTP'yî, bi nûnerên rêxistinên jinan ên li Stenbolê re hatin cem hev û ji bo mitînga wê di 31'ê gulanê de li Amedê bê lidarxistin piştgirî xwestin. Beşdarên Tevgera Jinên Azad û Demokratîk (DOKH) li hemberî polîtîkayên neçareskirina pirsgirêka kurdan û bi tevahî cureyên pêkutiyên li ser jinan, dê bi slogana "Lihevhatina Jinan a Aştiyê" di 31'ê gulanê de li Parka Ekîn Cerenê mîtîngekê li dar bixin.

Parlamentera DTP'ê ya Stenbolê Sebahat Tuncel û parlamenterên DTP'ê yên Amedê Gultan Kişanak û Aysel Tugluk, bi nûnerên rêxistinên jinan ên li Stenbolê û akademîsyenan re li Salona Taştê ya Ahtamara hatin cem hev. Di civîna taştê de jinên endamên EKD, EHD, ESP, SDP, Egîtîm Sen, DÎSK, Gokkuşagi, Eren Keskîn, femînîst û akademîsyên amade bûn.

Parlamenterên DTP'ê der barê mitînga dê ji bo piştgiriya bi jinên endamên Tevgera Jinên Azad û Demokratîk (DOKH) yên di operasyona li dijî DTP'ê de hatin girtin di 31'ê gulanê de li Amedê pêk bê agahî dan. Cîgira Hevserokên DTP'ê û Parlamentera DTP'ê ya Stenbolê Sebahat Tuncel, destnîşan kir ku ji bo şermezarkirina pêkanînên antî-demokratîk ên li hemberî jinên endamên DOKH'ê tên meşandin û dê mitîngê li dar bixin û xwest hemû jin piştgiriyê bidin mitîngê. **STENBOL / DÎHA**

# Panela 'Jin û Medya'

Cemiyeta Rojnamegerên Tirkiyeyê (TGC) û Navenda Fatusch Productions BV. a Holandayê bi mijara 'Di qada medyayê de jin û pirsgirêkên jinan' panelek li dar xist. Panel li salona konferansa Burhan Felek a TGC'ê pêk hat. Axaftina vekirinê cîgirê TGC'ê Turgay Olcayto kir. Olcayto, destnîşan kir ku li Tirkiyeyê li dijî newekheviya di navbera jin û mêran de xebatên taybet bên kirin û her wiha divê di nava civakê de cihê jinan hebe. Şukran Soner, diyar kir ku li Tirkiyeyê jin wekî hêza erzan tê dîtin. Endama Lijneya Enstîtuya Tirkiyeyê û Konseya Çapemeniya Holandayê Froukje Santing jî di axaftina xwe de bal kişand ser xebatên salên 1994, 2001 û 2005'an û diyar kir ku 3 xebat hatine kirin. Li gorî xebata Santingê li cîhanê der barê rewşa jinan de hin guherîn çêbûne lê hêj jî hin qelibên ku heyî neşikestine. Santing, got ku di qada çapemeniyê de jin tenê wekî mijarên magazîn têne nîşandan û wiha axaftina dom kir: "Di qada medyayê de dengê mêr bêtir derdikeve pêş. Kêm jin bi nûçeyên wekî polîtîka û aboriyê re mijûl dibin. Di wan qadan de jin ji sedî 19 têne temsîlkirin. Her wiha herî zêde jin bi nûçeyên mexdûriyetê derdikevin pêş."

Nivîskarê rojnameya Zamanê Today's, daxuyand ku li Tirkiyeyê jin di nûçeyan de zêde nîn e. Today's, destnîşan kir ku ji ber nêrîn û kevneşopiya civakê jin nikare xwe ji qalibên heyî rizgar bike. Nivîskar Ferai Dinç, destnîşan kir ku di nava çapemeniya tirk de berbelaviyek mezin û krîzeke aborî heye. Dinç, daxuyand ku bedela berbelavî û krîzê jin dide û jin dibe mexdûr. Dinç, got ku heke li cihekî newekheviyek hebe li vir neheqî jî heye û divê jin di sektora çapemeniyê de bibe xwedî fersendên wekheviyê. **STENBOL**

## Payîz WAN

# Jiyana her dayikê destanek e

Gelo wekî keçên wan dayika em ê çi bidin dayikên xwe, heta niha ji dayikê me re çi rewa hatiye dîtin. Ji wan re kîjan jiyan rewa hatiye dîtin? Ev pirsek wekî keçên van dayikan ku em ji xwe bipirsin. Belê îro li ser van çiya diyariyek madî ku em bidin wan nîn e. Jixwe em nehatine ku vê jî bikin. Wekî jinên kurd pêwîstiya dayikê me bi vê jî nîn e. Gelek car em hevalên jin behsa dayikên xwe dikin. Behsa serpêhatiyên wan dikin. Serpêhatiya her dayikek me bê guman destanek e.

Ev mînak di jiyana min de jî pir berbiçav e. Dayika min a ku hîn di temeneke pir biçûk de ji ber doza xwînê tê zewicandin. Gelo ez dikarim bi vê yekê dayika xwe tawambar bikim? Ez dizanim li erdnîgariya me çarenûsa hemû jinan di wateyekê de hema yek e. Dayika min hîn zarok bû bû dayik. Barekî gelek giran ketibû ser pişta wê. Ew hem dayik bû, hem jî navbênkariya doza xwînê dikir. Di milekî de ji bo bikaribe zarokên xwe bi aramî mezin bike, lê ji milekî dî de jî, ji bo êşa bavêmin fêm bike di nava çabayek bêhempa de bû. Ev rastiyek pir biêş bû. Dayika min jî neçarî çarenûsa xwe mabû û di temenê xwe yê biçûk de serî li ber vê çarenûsa xwar kiribû. Em kes nikarin dayikên xwe tawambar bikin. Weke keçên wan tu mafê me jî nîn e ku em vê bikin.


Dema ku dayikên me ji me re digotin min serî li ber vê çarenûsa xwar kir ku ji bo tu nekevî vê rewşê helwesta me gelek tund bibû. Çima te ev yek kir îro jî tu ji bo xwe vê dikî. Lê çiqas dem di ser temenê me re derbas dibe em pê dihesin ku helwesta me ne di cihê xwe de bû. Ew ne penaberê van waran bûn ew niştecihên van warên bedew bûn, ew nûnerê hestên herî xwerû bûn. Evîna wan a jiyanê di asta azweriyê de bû. Jiyan ji bo wana ne nepenî bû. Wekî rastiyek pir tazî bû. Nepenî ne di hestê wan de hebû ne jî di jiyana wan de hemû tişt di jiyan wan de rastiyên pir bi êş û tazî bû.

Me nivîsa hevalek ku ji bo dayika xwe nivîsîbû wergerand kurmancî. Di vê nivîsê de hevokekê ez pir bandor kirim, "Ez ê ji qontarê çiyan qevdek gulên bedew kom bikim û li ser lûtkeya çiya bireşînim, bila ba bêna wan ji bo te bîne." Xwezî gulên ku îro em dibînin û bi kêfxweşî li wan dinêrin hemû bi bêhna xwe ya bedew ji dayikên me re biçin. Di vê roja xweş de kes me li gel dayikên xwe nîn e, jixwe em ligel wan jî bin em nikarin tiştekî bikin. Tişta ku em bidin wan jî di wateyekê de qîmetê xwe nabe. Gelo em dikarin çi bikin? Li van warên azad tenê em dikarin baqek hêvî diyarî wan bikin. Bila di roja dayikan de jî diyariya me ji dayikên me re ev be. Bila ji bîbikên çavên me baqek hêvî be, di pêşeroja wan de bi azadî şîn were.

Wê rojê di meşa Amarayê de dayika ku kurê wê birîndar bibû dikir hewar û digot: "Erdogan digot jin jî be, zarok be jî lêdin, vaye lêdan niha dilê we rehet bû" di derfetên wek ên me de gelo tenê em dikarin ji bo dayikê xwe çi bikin? Ji bo dayikên xwe tenê em dikarin rojên azad hêviyên wan mezin bikin.

Em dikarin ji van çiya bibin dildarê azadiya wan û ji bo azadiya wan rojên xweşik biafirînin. Ji bo dayikên me negirîn em dixwazin şopên hêviyên nû vekin. Navê hêvî û dildariyên xwe bikin roja dayikên kurd.

BÎRANÎN



Îsmet BAYCAN (Endamê Koma Aştiyê)
(2003 – Girtîgeha Mûşê)

Rêheval Îsmet;
Ew vegotina xweşikbûn û delaliyê bû,
Ew gula tenêtî û
bawerî bû,
Ew çîçeka
masûmiyetê bû,
Ew destaneke nehatiye
vegotin bû.
Ew abîdeya meşa azadî û
biratiyê bû...
Ew Îsmetê dilmertal bû…

Ked û evîna te ya ji bo aştî û biratiyê tu caran nayê jibîrkirin. Dê her tim li bîra me be…

Mehmet Şirîn Tunç û rêhevalên wî yên têkoşînê

## Hay ji zarokê xwe hebin!

Red-Bull-Cola ji sebebê tê de kokaîn heye li Almanyayê tê qedexekirin. Hay ji zarokên xwe hebin, ev cola herî zêde ji aliyê ciwanên 13-18 salî tê vexwarin. Daîreya alman a çavdêriya xwarin û vexwarinê diyar kir ku di nava Red-Bull-Colayê de kokaîn heye û kesên vedixwe dike muptelayê xwe. Wezareta serfkaran jî li ser vê yekê destnîşan kir ku êdî Red-Bull-Cola ne vexwarinek û madeyek bêhişker e. Li ser vê ligel hê biryareke fermî ya qedexekirina vê colayê nehatiye wergirtin, gelek marketên mezin ew ji firotinê rakir.



# Ji 72 gundan re ocaxek tenduristiyê dikeve

**Ocaxa Tenduristiyê ya Gundê Sergirtî ku 15 kîlometreyan dûrî Wêranşarê ye, bi giştî xizmetê dide 72 gund û mezrayan. Her wiha 2 doktorên pratîsyen, 7 hemşîre û peywirdarekî tenduristiyê xizmetê didin 12 hezar nifûsî**

Ocaxa Tenduristiyê ya gundê Sergirtî ya bi ser navçeya Wêranşara Rihayê xizmetê tenduristiyê dide 72 gund û mezrayan.

Ocaxa Tenduristiyê ya gundê Sergirtî ku 15 kîlometreyan dûrî Wêranşarê ye, bi giştî xizmetê dide 72 gund û mezrayan. Gundê herî nêzî ocaxa tenduristiyê 10 kîlometre dûr e. Gundê Derelî jî bi 32 kîlometreyan gundê herî dûrî ocaxa tenduristiyê ye. Li Ocaxa Tenduristiyê ya Gundê Sergirtî ku xizmetê dide 72 gundan ku bi giştî 12 hezar nifûsa wan heye, 2 doktorên pratîsyen, 7 hemşîre û peywirdarekî tenduristiyê xizmetê didin. Rayedarên ocaxa tenduristiyê, dan zanîn ku di dayîna xizmeta gundan de tu tengasiyê nakişînin. Lê gundiyên dûrî ocaxa tenduristiyê ji vê rewşê bi gazinc in. Rayedarên ocaxa tenduristiyê ku li 72 gundan mêze dike, diyar dikin ku pirsgirêka herî mezin a gundiyan pirsgirêka hîjyenê ye. Rayedaran, daxuyand ku tengasiya wan a herî mezin ew e ku nikarin derman bigihînin hemwelatiyan. Bijîşkê ocaxa tenduristiyê ku nexwest navê xwe aşkere bike, wiha got: "Li gelek gundan tuwalet tuneye. Avên wan ne paqij in. Di serê nexweşiyan de jî enfeksyona qirikê kurmên rûvikan tên. Brucella jî nexweşiyeke din a mezin e. Nexweşiyên wekî tîfo û dîzanterî bi zêdeyî tên dîtin. Di mijara nêrîna welatiyên li vir de tu tengasiya me tuneye. Rojê herî zêde 30-40 nexweş tên. Em diçin gundên bi ser ocaxa me ya tenduristiyê û kontrola tenduristiyê jî dikin."

**Xwe nagihînin ocaxa tenduristiyê**

Ji şêniyên gundê Demya Çem Yusuf Sanal, anî ziman ku tevî tiştên rayedarên ocaxa tenduristiyê gotine nabin û wiha got: "Em di çûyina ocaxa tenduristiyê de gelek zehmetiyan dikişînin. Gelek caran dema em diçin ocaxa tenduristiyê bijîşk tuneye." Endamê Meclîsa Giştî ya Bajêr ê DTP'yî Îbrahîm Ozturk jî, wiha axivî: "Em van pirsgirêkan dizanin. Em çûn hemû gundên xwe û me pêdiviyên wan not girtin. Me bi gundiyan re yek bi yek hevdîtin pêk anî. Me pêdiviyên wan di raporekê de kom kirin û em dê vê raporê bidin Yekîtiya Xizmetê Dibe Gundan. Ji bo gundiyên me hîn zêdetir mexdûr nebin çi ji destê me bê em dê pêk bînin. Em dikarin bêjin heta niha tu xizmet neçûye van gundên me. Li gelek gundan pirsgirêka avê heye. Pirsgirêka rê heye. Pirsgirêka ceyranê heye. Ji bo çareserkirina van pirsgirêkan em dê têkoşînê bidin." **RIHA**

# Kameraya herî lezgîn hate afirandin



Li Zanîngeha Kalîforniyayê zanyarên ku bi Keîsuke Gode re dixebitin, ji kamerayên din cudatir û lezgîntir kamerayeke nû afirand.

Makîneya ku di saniyê de 440 milyar hêza wê ya ronîkirinê heyî di 163 nanosaniyeyê de wêneyekê dikare bikişîne. Zanyar difikirin ku mînaka makîneya nû di operasyona tibbî ya lazerê de bi kar bînin.

Kamerayên dijîtal ên niha bi teknîka CCD'yî dixebitin. Ji bo girtina agahiyan divê elektrîk ji hucreyek CCD'yî derkeve û li yek din bar bibe. Lê di kameraya nû de li şûna dedektorên CCD'yî teknîkek cuda hatiye bikaranîn. Yanî di warê optîk de hatiye bikaranîn. Bi vî awayî sînyal tenê ji dedektoreke ronîkirina pîksellîkê tê girtin. Bi vê sînyalê jî dîmen tê dîjîtalkirin.

Kameraya ku bi STEAM tê binavkirin ji bo ku optîka dîmenan bi hêztir dike ji xesasiyeta bilind û lezgîniya dîmen feydeyê digire. Zanyaran bikaranîna makîneya nû zindî nîşan dan. **KOLN**

# Li Çiyayê Qazê jiyaneke nû ava dibe

Li qontara Çiyayên Qazê ev demek e, weke însiyatîfa sivîl Çiftlîka Çareseriyê û Jiyana Ekolojîk a Mala kolektîf xebat dide meşandin. Hat gotin ku ev xebata ekolojîk temam bûye û gundê eko hatiye afirandin. Di riya afirandina gundê Eko de her diçe pêşketin çêdibin.

Xebatkarên mala kolektîfê daxwaz dikin ku jiyaneke ekolojîk biafirînin. Xebatkarên mala kolektîf diyar kirin ku deriyên wan ji bo kesên ku ji şîdetê dûr, bê otorîter û yên ku rêza wan ji bo cudakariya heye, vekiriye. Her wiha xebatkaran da zanîn ku ji bo cîhaneke din divê piştevaniya kolektîfê mezin bibe.

Xebatkarên Çiftlîka Çareseriyê û Jiyana Ekolojîk a Mala Kolektîf ji sala 2007'an heta niha li qontarên çiyayê Qazê wekî însiyatîfa sîvîl faaliyetan dimeşîne û her wiha xebatên xwe yên komleyê jî bi dawî kirin.

Komeleyê du roj berê serî li Qeymeqamiya Ayvacikê da û avabûna xwe îlan kir. Komele hedef dike ku ji vir şûnde dê di bin banê Komeleya Ekolojîk û Jiyana Xwezayî Ekolojiya Kolektîfê de piştevaniya kolektîfê mezin bike. Di rêzika komeleyê de tê destnîşankirin ku li Tirkiyeyê komele dikare kolektîf berdewam bike. Armanca afirandina komaleyê ev e ku kesên dixwazin gundên Eko ava bikin û di jiyana mirovan de wek mînak bidin jiyîn re alikariyê bike. Di rêzîknameya komaleyê de jî biryarên ku hene ji bo damezrandina jiyaneke ekolojîk a xwezayî re xizmetê dikin. Her wiha di rêziknameyê de tê gotin ku ewil girîngiyê bidin nirxên herêmî û kevneşopiyê.

Piştî ku avabûna fermî ya komeleyê hate îlankirin, ji aliyê mala kolektîf metnek hate amadekirin.

Di metnê de hate gotin ku agirê ku hildane mezin dibe û her wiha di nivîsê de armanc û pêşeroja mala kolektîfê tê vegotin. **ÇANAKKALE**

# Turnuvaya Basketbolê ya Kolanê



Turnuvaya Basketbolê ya Kolanê ku ji aliyê Şaredariya Kayapinarê ve tê lidarxistin dest pê kir.

3'yemîn Turnuvaya Basketbolê ya Kolanê ku ji aliyê Şaredariya Kayapinarê ve tê lidarxistin dest pê kir. Turnuvaya ku bi tevlêbûna 42 jê yên jinan bi tevlêbûna 162 taxim tê lidarxistin dê 3 rojan dom bike.

3'yemîn Turnuvaya Basketbolê ya Kolanê ku ji aliyê Şaredariya Kayapinarê ve tê lidarxistin dest pê kir. Di merasîma vekirina turnuvayê de Şaredarê Kayapinarê Zulkuf Karakekîn, Şaredarê Yenîşehîrê Selîm Kurbanoglu, Serokê DTP'a navçeya Kayapinarê Nesîp Gultekîn, Serokê Şaxa Egîtîm Sen a Amedê Abdullah Karahan, Nûnerê Basketbolê yê Bajêr ê Amedê Bulent Baykale, Berpirsyarê Herêmê yê Taximên Neteweyî Emîn Sevmîş, Midûrê Şaxa Spora Ciwanan Şahabettîn Aydin, Serokê Lijneya Hakeman a Bajêr ê Futbolê Akîf Gozmez û Serokê ASKF'ê Remzî Dayan amade bûn. Turnuvaya ku bi tevlêbûna 42 jê yên jinan 162 taximan tê lidarxistin dê 3 rojan dom bike. Di encama 3 rojan de ji bo taximên serkeftî dê kupayên şapiyoniyê û xelat bên dayîn. Şaredarê Kayapinarê Zulkuf Karatekîn ku axaftina vekirina turnuvayê kir, diyar kir ku ji bo ciwan di şertên hîn baştir de xebatên sportîf bimeşînin li gelek herêman sahayên semtan çêkirine. Karatekîn, wiha got: "Ji bo ciwanên me di şertên tenduristî de sporê bikin li Amedê di destpêkê de me sahayên semtan çêkirin. Ligel vê yekê me ji bo ciwanên me şarezabûna xwe derxin holê futbola kolanê, basketbola kolanê û turnuvayên futbola xîzê pêk anîn. Dema yekem turnuvaya basketbola kolanê hate lidarxistin 50 taxim beşdar bibûn. Lê 162 taxim tevî turnuvaya me ya îro dibin. Em ji ber zêdebûna taximên jinan gelekî kêfxweş bûn. Me biryar da ku di 5 salên pêş de 20 sahayên semtan ên din vekin. Em ji ber ciwanên me di şertên tendurist de sporê dikin gelekî kêfxweş in."



**'Em şaredar pîroz dikin'**

Nûnerê Bajêr ê Amedê yê Basketbolê Bulent Baykale jî, wiha axivî: "Ji ber Şaredariya Kayapinarê bi tevlêbûna 162 taximan turnuvayek wiha xweş li dar xistiye em ji şaredar re spas dikin. Her wiha ji bo şaredarê me sozên xwe yên ji bo pêşxistina bernameyên spora ciwanan bi cih aniye em careke din spas dikin." **AMED**

www.arsivakurdi.org